
helbest

**ŞÊX REZAY TALEBANÎ**



# DÎWAN

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Dîwanî Şêx Rezay Talebanî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Dîwan

ŞÊX REZAY TALEBANÎ

(1837–1910)

NEFEL
Stockholm
2004

www.nefel.com
info@nefel.com

**Şêx Rezay Talebanî:** Dîwan

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Nefel û Aras

Çapa dîjîtal: 2004
ISBN: 91-89687-17-5

Edîtor: Arif Zêrevan
Serastkirina latîniya kitêbê: Newzad Hirorî

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Ev kitêb bi hevkariya Nefelê û Arasê
hatiye amade kirin û weşandin.

Çapa yekê: 2003 – Hewlêr
Komkirin û serastkirin: Şêx Mihemedê Xal û Omêd Aşna

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# nêwerok

**Pîtî a ... 9**
Dilberî bêwefa ... 9
‘Eşretî Caf ... 10
Bem şî‘rane Şêx Reza daway tûtinî bondar ekat le Hacî Es‘ed Axa ... 11
Bo mudîrî Qizillce ... 12
Destêkî heye ... 13
Çiwarîne le hecûy Şêx Heme ‘Elî da ... 15
Çiwarîne le hecûy qazîy Koye da ... 15
Caşiktirrên ... 15
Wellamî Mistefa Begî Bawecanî bo Şêx Reza ... 17
Bo Emîn Feyzî ... 18
Hemadî be Şêx Reza dellêt:. ... 18
Wellamî Şêx Reza:. ... 18

**Pîtî b ... 20**
Le fîraqî Qadirî Westa Xidir ... 20
Derdî hebîb ... 21

**Pîtî d ... 23**
Serguziştey xoy û hecûy Şêx Xefur ... 23
Le basî bab û bapîrî ta degate xoy ... 25
Keş û fişkirdinî Beg ... 26
Seru û ney ... 26

**Pîtî e ... 28**
Hecûy mayne kiwêt ... 29
Weznit le çiyay Qafewe ... 30
Hecûy Şêx Xefurî mamî ... 31
Kake Caf kurrî Kerîm Axa ... 33
Kelleşêrî neqîb ... 34
Dewllemendî sahêbpare ... 35
Mall mudîrî ... 36

Katêk Simayilî Mela Xalîd le sefer hatewe, Şêx Reza em şî'rey nûsîwe: ........ 37
Hecûy Hemey Westa Fetah ........ 38
'Îlletî qa'îmmeqam ........ 39
Hecûy Sineyî ........ 39
Şêxeke ........ 40
Waqewaqî dill ........ 40
Wîlayetî Bexda ........ 40
Mestî Efendî ........ 41
Berxe nêrê ........ 41
Bo Şêx Elî biray ........ 44
Wellamî Westa Şefê ........ 45
Şêx Homer ........ 45
Hemadî wellamî edatewe ........ 46
Em beytey Şêx Reza le wellamî beytêkî
Westa Şefêy sineyî dawetewe ke dellêt: ........ 47
Şî'rî Şêx Reza bo Mela Hemdûnî şa'ir: ........ 49
Mela Hemdûn wellamî Şêx Reza edatewe: ........ 49

**Pîtî ê ........ 50**
Her bilûkêkî 'ecem ........ 50
Suhbetî Şêx Elî ........ 51
Hewşekem ........ 52
Bo çî etirsim ........ 53
Pêncxiştekî le ser xezelêkî Mistefa Begî kurdî ........ 55

**Pîtî î ........ 59**
Kelleşêrî kirmaşanî ........ 59
Stayişî kak Ehmedî Şêx ........ 60
Şerrî Cebarî û Dawide û Kakeyî legell Tallebanî ........ 61
Biraza 'ezîzekem ........ 62
Mayînekey kiwêxa Elî ........ 63

**Pîtî k ........ 68**

**Pîtî l ........ 70**

**Pîtî m ........ 71**



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**Pîtî n** .......... **74**
Alî Bebe .......... 74
Şêx Elî Tallebanî .......... 75
Em sade ruxane .......... 76

**Pîtê o** .......... **79**

**Pîtî q** .......... **80**
Stayişî Şêx Star .......... 80

**Pîtî r** .......... **82**
Kurrêkî bulxar .......... 82
Stayişî Ehmed Paşay Baban .......... 85
Azayî eşretî Tallebanî .......... 86
Hetîwêkî sineyî .......... 88
Wellamî Westa Şefêy sineyî bo Şêx Reza .......... 89
Hecûy Kakeyî .......... 90
Hecûy Tallebanî .......... 96
Bo Mam Resûll Siyamensûrî .......... 97

**Pîtî s** .......... **98**

**Pîtî ş** .......... **99**
Êstirêkî rût û qût .......... 99
Texmîsî Şêx Reza le ser xezelêkî xiwace Hafîzî Şîrazî
le hecûy Me'ruf Efendî başkatibî bîdayetî Hewlêr .......... 101
Katêk Me'ruf Efendî kareke bo kabra cêbecê dekat,
Şêx Reza em beyte şî'rey bo denêrêt: .......... 103
Hecûy mudîrî tehrîrat .......... 103
Be boney kuştinî Nasiredîn Şawe .......... 103
Le hecûy Şêx Ehmed nawêka .......... 103
Şêx Reza le hecûy Şêx Reşîdî amozaya ellêt: .......... 104

**Pîtî û** .......... **105**
Murad Axay Ako .......... 105
Suleymanî ke darulmilkî Baban bû .......... 107
Le wextî zerfên da .......... 108

Nînokî Şêx Reza û kilkî Hesen Hemze . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 109

**Pîtî w. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 111**

**Pîtî x . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 112**

**Pîtî y . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 113**

**Pîtî z . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 114**

**Nêwan Şêx Reza û kesanî tir. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 115**

# Pîtî a

**—1—**

## Dilberî bêwefa

Rojê nebû em dilbere bêrehme wefa ka
Carê nebû em kafire şermê le Xuda ka

Heyran in egîba le ‘îlacî merezî min
Luqmanî wîsallit meger em derde dewa ka

Karê ke xem û derdî fîraqit be minî kird
Serma be hetîw ba be dewarî şirrî naka

Dêwane ye şexsê ke be xeyrî lebî le‘lî
Wek şahî Sikender tellebî awî beqa ka

Tab û tebî ateşkedeyî hîcrî weku şêt
Nezdîk e minîş warîdî sehrayî fena ka

Lem rêgeye teqdîrî ezel wa bû ke ême
Pamallî cefa bîn û reqîb seyr û sefa ka

Roh û dill û dîn hersê ekem be zil û nîsarî
Kamî dillî min eger le lebî le‘lî rewa ka

Ser danê le rêy eşiq Reza lazim e aşiq
Bo yar ser û mallî superî tîrî qeza ka

## — 2 —
## ‘Eşretî Caf

Xizmîne meden pence legell ‘eşretî Cafa
Mêrûle neçê çak e be gij qulleyî qafa

Kê bê le dilêranî ‘eşayir ke neçûbê
Wek tîrî qeza nûkerimî Cafî be nafa

Xwênrrêj û şerrengêz û ‘edubend û tenumend
Kamyan gene wek şêr e le meydanî mesafa

Çunke resen in wird û diriştîyan hemû cengî în
Mey sarî ye neş’ey çi le durr da çi le safa

Wa bê xem û perwa deçine erseyî heyca
To naçîye ser doşekî bûkî le zefafa

Yebxûne îlal emrî sîxaren we kîbaren
Yes‘ewne îlal herbî sîqalen we xîfafa

Wesman begyan amîr e wextî ke billê: Dey!
Dêne cewelan herweku hacî le gewafa

Xahem zi xuda ankê şeved duşmenê cahet
Kotî le desa, des le mila, mil le tenafa

Rehmê bike ba Şêx Reza bêtewe guftar
Heyf e birrzê tîxî micewher le xîlafa


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 3 —

## Bem şî‘rane Şêx Reza daway tûtinî bondar ekat le Hacî Es‘ed Axa

To kemnezer î derheqî min êstêke Axa
Min mawme heway suhbetî tom her le demaxa

Ta rojî qîyamet be Xuda zîndû we namirê
Babê ke bimênê kurrî wek toy le wecaxa

Bo tûtinekey Bîşeme û Şawir û Şêtine
Şêt bûm û nehat, wext e dillim derçê le daxa

Caran çi be cax û çi be bar bot dehenardim
Nanêrî emêsta ne be bar û ne le caxa

Rêy newteke bacgîrî eger zor e defermûy
Rêy Xase be şew xallî ye ba bê be Bulaxa

Nemzanî felek gobenî her bo min e ya xu
Sed destî weku destî minî kirduwe be zaxa

Ya reb guzeran ka be sefa wextê ezîzit
Peywest e le dewrî çemen û gerdişî baxa

Bo çûnetewafî heremî şahîdî meqsûd
‘Alem hemû me‘zûn e Reza her le yesaxa

## — 4 —
## Bo mudîrî Qizillce

Le teref kêrewe berîdî seba
Bo mudîrî Qizillce name deba

Bo cenabî muqerrebîl xaqanî
Mîr ʻElî Beg le encebî nuceba

Mîrim aya çi lon e ʻîlleteket
Baz be xarişt e bin gunit eceba

Îhtîyacit binûse eybî çî ye
Mehremî razî tom be ʻehdî sîba

Sed tirrit da be kûdekî le gunim
Ey tirrit reʻd û wey tisit reşeba

Dûdemantan çirûk e bunyadî
Bo qebahet “benim dexîl, he beba!”

Ebdurehman Begî birat fermûy
Abrrûy xanedan ke ʻElî eyba

Xalle kiwêreş seraheten eywit
Ke ʻElî Beg bûwe be dêlle beba

Le abaʻit îba meke mîrim
Hazîhî îrsîkum exen we ʻeba

Ger be kêrî Qizillce têr naxoy
Were Şêx Reza be reşta ba


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 5 —
# Destêkî heye

Destêkî heye Mestî Efendî le kerem da
Mîwanî ‘ezîzî heye dayim le herem da

Elheq jinekey muşfîq e derheq be xerîban
Sed ganî be rom dawe hezarî be ecem da

Hênd kêrî hetîwan be kuziya çûwe daykî
Destêkî şkabû be minallî le şekem da

Ber zerbeyî kam kêrî qewî kewtuwe axo
Bew derde çûwe sa‘îdî Reşîdî le rehim da

Hetta ke Mecîdî kurrî teb‘î cewad e
Sed ganî be yek lehze be bê pûl û direm da

Gewwad û teresî mulhîd û bêdîn û munafîq
Merdûd nîye mîslî le misqof û ‘ecem da

Bo seddî rehî qaflle wek tepllî Sikender
Awazî dehollî kuzî dayikî le herem da

Ew kêre ziley kê bû le kêlanî Fetah Beg
Miştêkî kutaye kuzî, miştêkî le dem da

## — 6 —

Nîme bo teswîrî ebrot peyrrewî manî deka
Şane bo zincîrî zullfit enber efşanî deka

Qûtî ruh e lêweket yaqût weha awdar nîye
Men'î bazarrî 'eqîq û le'lî rummanî deka

Xallî serlêwit nigîn û xatemî nadir zihûr
Muhrî destî asef e hukmî Suleymanî deka

Dill le neş'ey 'eksî mestî çaweket la ye'qil e
Bo kebabî cergî min lêwit nimekdanî deka

Bergî sertapam pellas bê ger be şertê tom bibê
Tarî ew berge le lam sed şallî kirmanî deka

Sedhezar car dexîl im herfî bedkar meşnewe
Herçî derbarem billê bê pîre şeytanî deka

Ger le perdey nazewe awazî to bigrête giwê
Bulbulî şîrînzuban meylî xezelxwanî deka

Kes nîye ew şoxe hallî ka le sozî ateşim
Wa Reza dîsan le 'îşqî her xezelxwanî deka


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## —7—
## Çiwarîne le hecûy Şêx Heme ‘Elî da

Sabî zigî xot hellmedirre û memire le daxa
Em qewme hemû mirdin û to mayî le wecaxa

Lew lawe regêkit le Zehaw hell‘enîşê
Lem lawe regêkit le kinî Sawcebulaxa

## — 8 —
## Çiwarîne le hecûy qazîy Koye da

Şêx Reza bêt û le ser to hecûy qazîy Koy bika
Seyrî ke çî bika, dom bê û killaş bo xoy bika

Çunke xedrî kird le lamî‘ şert bê qazî wa bigêm
Her gen û gûyê le zig ya ye be carê roy bika

## — 9 —
## Caşiktirrên

Caşiktirrên Mikayil we‘dî be ser nehêna
‘Umrî geyişte heşta wazî le ker nehêna

Le neslî ker nebiwaye jinî ehêna, bellam
Wazî le yeksimxanî xatû zerrker nehêna

Gîske gerreyî birde çoll ta kerêkî pê bigrê
Le negbetî ew careş karî be ber nehêna

Neyzanî terrbehar e wilax tîya detûrrênê
Xoy kirde pendî şarê, qet way zerer nehêna

Em bazî bû tirrandî be ber koşya tûrrandî
Ta rîxî dernehêna te'rîxî dernehêna

**—10—**

Le segim pirsî: 'Eceba qewmt e Husnî Paşa?
Tûrre bû kilkî leqan û witî: Haşa haşa!

Rastî gerçî segîş im be Xuda xom dekujim
Nawî min bênî le gell îsmî xebîsî Paşa!

**—11—**

Le sexa û le kerem da
Le fesahet le edeb da
Yekebaz e le sefer da
Yeketaz e le hezer da

Taqe'eybî ke hebê
Her ewe ye taqekes e
Le hemû xakî ereb da
Le hemû şarî 'ecem da

**—12—**

Kafî kilk û kafî kûn û kafî ker têkell kira
Îsm û naw û şoretî Kerkûkî lê teşkîl kira

**—13—**

Daxillî ferc e le ser qing kêr be gun de'wa deka
Nanî Kunemasî dexwat û pasî Cirtawa deka

**— 14 —**

Ehmeq im nemkird heta rîşim nebû ganê bidem
Mistefa Beg çakî kird ta rîşî hat her ganî da

**— 15 —**

## Wellamî Mistefa Begî Bawecanî bo Şêx Reza

Katêk wek pasnaw bîkutme jêrit
Wek çeqçeqey aş hellperrê kêrit

**—16 —**

Kê dîwyetî ey Şêx ‘Elî mallî xezûr bo zawa
To le kiwê tekye le kiwê bizinegerrî Meznawa

**—17 —**

Sê îsim hen bê musemma herweku awî beqa
Teyirî ‘enqa, şarî Cabulqa, pillawî Xaneqa

**—18 —**

Marîreşe xinkawe le gêjawî xela da
Kêrme le qingî kake Hemey Hacî Mela da

**—19 —**

Meylî eş‘arim heye, tîxî zibanim mû deka
Her kesê carêk bigêm pirr be şarê gû deka

**— 20 —**

Yehûdî be çeyekim girt û lêm bird û tiya xûsa
Ke têm na çawî nûsa bangî kird: Ya hezretî Mûsa

**— 21 —**

Demarî mirduwe kêrim le marî mirdû deka
Le saq û sa'îdî mîhter nesîmî cadû deka

**— 22 —**

Şêx Setar êmey bezand bo melay gun sengela
Dînî pêxember be aşkar xoş e ya min ya Mela

**— 23 —**
## Bo Emîn Feyzî

Be xeyrez mîhrî to ger bê le dillma
Zirrey zincîrî zallim bê le milma

**— 24 —**
## Hemadî be Şêx Reza dellêt:

Daney demit nemawe û le gef nakewî hêşta
Pîrekerî çenebaz ellêm bikem be leşta

**— 25 —**
## Wellamî Şêx Reza:

'Emrim geyî be heşta kêrim bekar e hêşta
Tesdîqî ger nefermûy hestim berim be reşta

**— 26 —**

Her le dengî kerrena û şeypûrî Cengîzxan deka
Wirdeahengî piyawî pîr ke wextê gan deka

**— 27 —**

Çunke şa'ir zor bûwe lem 'esre da
Bote heşrî nêreker lem hucre da

**—28 —**

Le bo mexbûrî û lêllî dû-sê têllam le zê werda
Weku şexsê ke çend kêrê le ser çeşmey quzê werda

**— 29 —**

Kûpe hey'et, rû qere, sînek sifet, dînar perist
Eskemil mil, meşreb oxlan, karî papazî deka

# Pîtî b

**— 30 —**
## Le fîraqî Qadirî Westa Xidir

Bo nesûtê ciger û bo çî nebê dill be kebab
Bo çî nerrwa le tenim rohî rewan mîslî şehab

Bo le serçaweyî çaw hellnequllê reşheyî xwên
Boç le fewarîyî mujgan netikê qetreyî ab

Bo le ber nalle nebê hellqeyî hellqim be sirûd
Bo le ber girye nebê çeşmeyî çeşmim be serab

Mu'nîsî roj û şewim ba'îsî aramî dillim
Royî û min le xemî kewtime nêw behrî 'ezab

Be wiqû'î seferî Qadirî Westa Xidir
Xaney 'eyşmî tall kird felekî xanexerab

Çeng û ney lê mede ey mutrîb ke le ber fîrqetî ew
Rinekî roh e le giwêm nexmeyî awazî rebab

Saxirî mey mede saqî ke le ber dûrîyî ew
Tall e wek jehrî helayîl le mezaqim meyî nab

Karî kirdin nebû em kare ke gerdûnî denî
Kirdî, rûy reş bê weku bextî min û perrî xurab

Ey Reza reng e le ber fîrqetî ew mu'nîse to
Qet nebî xallî weku kûre le sozî tep û tab


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## — 31 —
# Derdî hebîb

Demkujê hukm e dezanim be Xuda derdî hebîb
Were sa beşqî Xua des le yexem berde gebîb

Were destêk bixeme gerdinî bilûrînit
Ta weku sifre le daxa bidirrê wirgî reqîb

Tali‘im nehs e etirsim ke be azarî fîraq
Bimirim û rojê nebê dewlletî wesllim be nesîb

Çawî fettanî to ew sahîre cadûgere ye
Ke be yek ‘îşwe eda ‘abîdî sed salle ferîb

Ta le to dûr e dillî xemzede ey rahetî can
Meşrîq û mexrîb e mabeynî legell sebir û şekîb

Bê firaz nabê neşîb em qise tehqîq e welê
Min le rêy eşqî to nemdî be Xuda xeyrî neşîb

Xeyrî zullfe le ser sefhey rût sabît e ya
Gînet û gîbe ke memzûc e legell zînet û zîb

Şêx degorrêtewe ger çawî be zullfit bikewê
Xerqe û sebhe be zunnar û çelîpa û selîb

Taqetî taq bûwe bêçar e le jêr barî fîraq
Bike rehmê be Reza, çak e terrehum be xerîb

## —32—

Şêx Se‘îd serdar e Şêx me‘ruf heta hezkey necîb
Bo cewanmerdî û şeca‘et beynî beynella neqîb

Ger reqîb nebiwaye mabeynî ême key têk deçû
Kêr be kuz dakî mufetîn gû be rîş babî reqîb

# Pîtî d

## — 33 —
## Serguziştey xoy û hecûy Şêx Xefur

Ew roje ke toram û le Kerkûk seferim kird
Manendî ʿeqarîb le eqarîb hezerim kird

Gerdûn sinekî kirdim û hênamye Koye
Mîwanî le kin Mame Xefurî lecerim kird

Xwastim ke birrom bo seferî Rom be seyahet
Neyhêşt û dûsed ehlî ʿemamey le serim kird

Danîşê neçê min kiçî xom mare dekem lêy
Ew talîbî dinya ye ewa muʿteberim kird

Çirûsa le berim cubbe û fisa le serim fês
Ne fêsî le ser nam û ne cubbey le berim kird

Şeş mange bem qisane gilî damewe lay xoy
Nemzanî milim bişkê tîya çûm zererim kird

Wellahî dekem derheqî ew bellku ziyatir
Ew kare ke derbarey Reşîdî piserim kird

Karim terr ebê emwit eger lutfî bibê mam
Ey layiqî rîşî be Xuda karî terrim kird

Bo muctehîdan gerçî cewazî nîye teqlîd
Min muctehîdim hatim û teqlîdî kerim kird

Ey gûy Xile bem lutfe ke ew kirdî legell min
Lem merhemet û lutfe ewa min guzerim kird

Herçende witim wextê ke dîm nexwetî qelbî
Ya reb legell Şêx Elî bo çî şerrim kird

Her deçmewe lay gerçî billê hatewe dîsan
Ew xwêrrîye bêkare ke min lêre derim kird

Herçende Reza ba'îsî bednamî ye 'ewdet
Lem sûkî û bednamîye serfî nezerim kird


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 34 —
## Le basî bab û bapîrî ta degate xoy

Xuda wextê hezka bendeyêkî xoy bika xoşnûd
Le rêgey dûrewe boy dê be pêy xoy şahîdî meqsûd

Le Hîndistanewe şeş mang e rê ta xakî Kurdistan
Xuda Şêx Ehmedî hîndî rewan kird bo Mela Mehmûd

Mela Mehmûdî Zengine ye'nî qutbî daîrey îrşad
Le dewrî merqedî her dengî yahû dêt ya me'bûd

Le paş ew Erşedî ewladî Şêx Ehmed le cêy danîşt
Bî 'eynî wek Suleyman cênişînî hezretî Dawûd

Bellê babî weha ellbet debê firzendî wa bênê
Îlahî sedhezar rehmet le qebrî walîd û mewlûd

Be rehmet çûn ewan ba bêynewe ser basî Ewrehman
Fîdat bim ey netîcey dûdemanî Ehmed û Mehmûd

Netîcem meqsede tallî muqeddîm şertî tehsîl in
Ewaney bo îcad kird Xuda ta em bibê mewcûd

Emêstaş Şêx Elî neclî kebîrî sahîb îrşad e
Emîş wek bawk û bapîrî le zumrey ewliya me'dûd

Rezaş lew nesle ye bîbexşe ya rebî ke qet nabê
Gullî bêxar û behrî bê buxar û agirî bêdûd

## — 35 —
## Keş û fişkirdinî Beg

Le Beg wa bû ke min matim kişî kird
Ke min hestam û ew dabû fişî kird

Gehê seyranî ser gun bû gehê kêr
Heqîqet Mistefa Beg gerdeşî kird

Debû bawkî segî nawnaye emma
Begî nawna qurimsax yaxnişî kird

## —36 —
## Seru û ney

Seru û ney Çîn ke legell qametî to bêne neberd
Şekerî xwarduwe ney seru serî dawe le berd

Ger delîlî weku nuqtey dehenit nebiwaye
Minîş înkarim ekird wek hukema cewherî ferd

Lêy deparrêmewe ey ruhî rewanim tu Xua
Çî ye dermanî dillim pêm dellê: Laço dill e derd

## — 37 —

Gerçî Mîranî Xidir Beg muddetêk qur'ey neda
Par le Xoşnaw qur'eyan kêşa û gelêkyan pêwe kird

## — 38 —

Wextê Nacî rût kira wek şêrî nerr cengî ekird
Gahgahêkîş le tirsan wirdeahengî ekird

**— 39 —**

Heyderî Kerrrarr e yaxo Xalîdî îbnî Welîd
Rostemêk e rojî de‘wa beynî beynella Hemîd

**— 40 —**

Qurbanî pelî bim ke pelî Hempelî pel kird
Xoy û segekey herdû be carê şeq û şel kird

**— 41 —**

Gû be rîşî tenikî ‘Ebdurehman Begî qayimiqam
Ew ke beynêk bêziyan bû, Bazîyan mexrûrî kird

Tallebanî bû ke sifre û nan û xwanêkî hebû
Day be serya herweku xepley qingî xapûrî kird

# Pîtî e

**— 42 —**

Şarî Koye ke lebaleb butî tuşneleb e
Ger felek lêy bigerrê menbe'î 'eyş û tereb e

Dillberanî be mesel herweku eşa'rî min in
Kamî lê degirî debêjî emeyan muntexeb e

Xaretî eqllî minî kirduwe zîna senemê
'Arîzî reşkî qemer qametî nexllî ruteb e

Newzerr asa fereydûn sîfet û selim rewş
Şeyde manend sîyaweş, Weş û Xusrew leqeb e

'Arîz û xebxeb û ruxsar û zenexdan û lebî
Nazik û tuhfe û zêba û bedî' û 'eceb e

Dillber û zerrkemer û cîlweger û 'îşwefiroş
Seruy sîmîn û beden û şahîd û şîrînleqeb e

Zallim û dillşken û dostkuj û xesimnewaz
'Îsewîdîn û muxayin û ferrengîmezeb e

Sêwî danawe le jêr lêw ke emem goy zeqen e
Zîwî xirr kirduwe wek gok e emîşim xebeb e

Lalerrû, şêftemû, xalîb e bo erebede co
Rûy weku mahî felek zulfî weku zûzeneb e

Xwastî lêy maçê Reza kafire neydaye witî
Ey Xua lem kurre şêxzadeye çend bêedeb e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## 43
## Hecûy mayne kiwêt

Mayne kiwêt caran ke detgut rewtî rewtî ahû we
Êste hestanî le ser axurr be yahuyahu we

Qet le yek qasnax kemî co nademê hêşta lerr e
Sallî diwanze mang siwarî nabim û her mandû we

‘Umqî çallî meq‘edî bêşik mesafey qesr ebê
Dirzî derwazey kuzî loçloç be serî yek da çûwe

Ger be awzengî perasûy em ser û ew ser helldirrim
Hênde nabizwê bizanim mawe ya xud mirduwe

Xawenî pêşûşî nazanê ke te’rîx û seney
Çend e emma min le pîranî qedîmim bîstuwe

Wextê Nadir Şa hicumî kirde ser îqlîmî Rom
Taz e giwa ye ew le kuz dakî xirûcî kirduwe

## — 44 —
# Weznit le çiyay Qafewe

Weznit le çiyay Qafewe lem qafîye nawe
Ya şî'rî xezel xezel e be rîsey petî xaw e

Şabîstey neqdêkî berawirdî 'erûz e
Lam wabê ke belay to we neqdim natewaw e

Ewzanî şî'r heryeke merbût e be behrêk
Lem şazde bihûrey be 'erûz nawî nirawe

Be dillêkî firawan were hasill ke qena'et
Lay ehlî edeb rexne weku xemzey çaw e

Ey Huznî qebull ke le Reza keşfî heqîqet
Toş wek minî her talîbî efwîn le Xudawe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 45 —
## Hecûy Şêx Xefurî mamî

Mamekem qehbejin e dewlletî Şeddadî heye
Tal'î rahber û bextî Xuda dadî heye

Yek dû dêy dawetê Sulltan îg'amî ge'am
Her yekêkî be qeder xezneyê îradî heye

Çi firoş û çi ziruf û çi zîya' û çi 'eqar
Le hemû cinse meta'ê sed û heştadî heye

Em hemû genc û xezêney heye hêştaku teres
Ne heway cud û ne meylî kerem û dadî heye

Resmî aba'î kîramî bûwe asarî sexa
Ne le aba'î heya û ne le ecdadî heye

Ger ser û rîşî piyawane ye bawerr meke pêy
Batînî cûleke ye zahîrî zuhadî heye

Xoy be her sûret umêdî keremim pêye welê
Riqî zorim le Reşîdî kurrî gewwadî heye

Rengî ker, dengî beqer, hey'etî dell, xûy çeqell
Çawî kiwêr, mexzenî kêr, meq'edî pirr badî heye

Zîkr û ewradî le ser kêr û zeker munhesîr e
Seyrî ew hîze qurrimsaxe çe ewradî heye

Tif le kuz dakî le kin xoy kurrî hênawete der
Gû be rîşî bawkî le kin xoy emîş ewladî heye

Eme gişt bawkî ke sermeşqî le bo dadawe
Serbexo salîkî rehrew nîye ustadî heye

Le giruhî herem kareker û dayik û xuşk
Fatim û ‘Asim û aman û perîzadî heye

Şew û roj çeplle be kuz lê deden û helldeperrin
Ferciyan tab û tebî kûreyî heddadî heye

Bêheyan cumle xisusen jine sozaniyekey
Rewiştî dêlle seg û qehbeyî Bexdadî heye

Min le Kerkûkewe dênête kin em qehbejine
Legellim xesm e felek niyetî bêdadî heye

Kûnî û hîzî ye manendî Reşîd, teb‘î Reza
Hênd le ber cewrî felek xatirî naşadî heye


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 46 —
## Kake Caf kurrî Kerîm Axa

Şîrîn weku Xusrew piserî Hurmiz Caf e
Çaw mamiz e, lêw qirmiz e, îman siz e, caf e

Çawî reşî fettanî weku şebrewî ‘eyyar
Dîn û dill û îmanî dizîwim dize cafe

Burhan e le ser qudreyî heq ayetî husnî
Bo de‘weyî îspatî Xuda mu‘cîze caf e

Aşûbî cîhan fîtneyî afaq e nîgahî
Yek nefs e cîhanê le desî ‘acize cafe

Bo keşmekeş û ‘erebede mujganî siyahî
Wek leşkirî Teymur û supay Cengiz e Cafe

Tenya ne Reza boy bûwete bendeyî
Fermanî le ser şah û geda nafîz e hafe

## — 47 —
## Kelleşêrî neqîb

Ew be hey'et kelleşêr e ke be hellmet şêr e
Keremit kirduwe bîstûme desa bînêre

Dû mirîşkîşî legell da ke firîşkî nekewê
Xirtî çend salle ye ellbet be mirîşkan fêr e

Barekella Hesen Axay kurrî Mehmûd Axa
Kefî feyyaz e dillî wasî' e çawî têr e

Ne weku şarî Suleymanî ye Koye bekerem
Ne weku Tawiq û Kerkûk e ne wek Hewlêr e

Ew hemû şî're ke nardim kelleşêrêkî nenard
Ceddî 'ela ye neqîbzade ye xoy bêxêr e

Dostan em kelleşêre weku te'rîfî eken
Bo Reza lazim e em nêreke ye ew nêr e

Hedîyeyekî ke le geref dostewe bê şukrî dekem
Pêy rezamend im egerçî terefêkî kiwêr e

Qafiyey teng e, nezîrey meke şa'ir zînhar
Ewî lem qafiye bot mawetewe her kêr e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 48 —**

## Dewllemendî sahêbpare

Xeber çû bo mîre sûre
Qurban Şêx Sallih mexdûr e

Xoşî xoşî pê kewt witî
Agire sûre le xom dûr e

Kesî feqîrî bêçar e
Ger ‘eybî hebê diyar e

Dewllemendî sahêbpare
Sed eybî hebê mestûr e

Agir eger le mallî çê
Ellên agir nîye nûr e

Ne nûreylê ne sûreylê
Şapllîteylê derqûneylê
Qisey cûlekey meşhûr e

— 49 —
## Mall mudîrî

Mall mudîrî ke xellkî Hewlêr e
Herweku mûy xaye bêxêr e

Sûret û sîretî le piyaw naçê
Ew qurrimsaxe mê ye ya nêr e

Min be mexfî ke çûm û têy fikrîm
Bezmî xewxa ye meq‘edî kêr e

Dîm Husên kirdî qesdî qetllî Fetah
Weku Yunis ke des be şimşêr e

Heremî muhteremî ke Le‘lîxan
Xermenî ‘îsmetî geray kêr e

Rawî rêwî hemû le bo kewll e
Gurg le bo berxe dête naw bêre

Behrî awdanî mezre‘ey fericî
Cûtegun cût e, kêrîş awdêr e

Witim: Ey bêheya to natirsî
Le Xuay roj û mang û estêre?

Witî: Ya Şêx eman meke men‘î
Ehlî qonyan be qûnî ew fêr e

Nîye bakim ger ew xebîse billê
Ewe eş‘arî lamî‘î kiwêr e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 50 —
## Katêk Simayilî Mela Xalîd le sefer hatewe, Şêx Reza em şî'rey nûsîwe:

Hatewe aşûbî dewran merdî meydan hatewe
Şêrî Yezdan Lendehorî îbnî Se'dan hatewe

Bo qirranî leşkirî e'da le nakaw mîslî berq
Esxerî sahêbqiran û le'lî xeftan hatewe

Hewrî mîhnet, barreşî xem, seylî matem bû temam
Berqî taban, mîhrî rexşan, re'dî xerran hatewe

Pallewanî paytextî sefdirrî Şêrzadxan
Tacbexşî kîşwerî mexrîb Elubxan hatewe

Se'dî sefdirr malîkî ejder hozbirî pirr huner
Bêjen û gîw, tûs û newzer, pûrî destan hatewe

Hemdulîla baz le bo qetllî serî tûranîyan
Rostemî mazinderan samî Nerîman hatewe

Jêrdestî Es'ed Axa bûyn weku mûrî ze'îf
Bo xelasîman Simayil wek Suleyman hatewe

Dostan lebtuşne bûn agah le feyzî lutfî heq
Coy Nîl, deryay Qulzem, behrî 'Umman hatewe

Pêy eka etk û siyaset herkesê xoy hez bika
Qatillî rohî Heme û celladî Wesman hatewe

Lamî'î şa'ir be her meclîsê biçê xellkî ellên
Bulbulî destan sera, murxî xezellxwan hatewe

## — 51 —
# Hecûy Hemey Westa Fetah

Hezar efsûn û cadûy pêwe awêzane em rîşe
Îlacî ger bibê ya gûz e ya giwêzan e em rîşe

Betehrîkî tellêkî sedhezar nefsî be kuştin da
Re'îsî hîlekaran şay qumarbazan e em rîşe

Be bay serrserr le şiwên xoy nacimê rîşey emend sexte
Bebê hîkmet nîye ger carbecar lerzane em rîşe

Be zahîr saf e wek zîwî spî emma le batîn da
Reş û pîs û mulewwes wek binî qazan e em rîşe

Bemekrê emrretênê hez bika her lêre ta Mukrî
Penahim dey Xudaya xawenî zorzan e em rîşe

Ke seyrim kird dezanim Şêx le min mesrûr e ya 'aciz
Hemey Westa Fetah bo hallî min mîzan e em rîşe

Hezar hewsar û desbend û gurîsî lê dirust ekrê
Be sed batman xurî ger deskewê herzan e em rîşe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 52 —
## ʻÎlletî qaʻîmmeqam

Rebbî qet tûşman nehênî ʻîlletî qaʻîmmeqam
Ême tabî herb û zerbî kêrî paşaman nîye

Her kesê bîgê dellê ey aferîn sed aferîn
Dujminî sadat e qet bakî le dan û man nîye

Dûhezar kêrî piya roy ne xara meqʻedî
Ême mîrim metreqî wek sengî xaraman nîye

Bîkujin kêrxor e namûs û heyay kurdanî bird
Qet le kurdana dellêy piyawêkî azaman nîye

## — 53 —
## Hecûy Sineyî

Superî ehlî Sine bo şerrî bêgane jin e
Xobexo şerr deken û esleheyan her betine

Riqî hellsa sineyî dê le suleymanî eda
Aferîn ehlî Sine em riqetan her le kine

Ehlî ême ke çûwe şarî Sine, hukm e egê
Be dû şahî û qerepûlê jinî kamyan mezine

## — 54 —
## Şêxeke

Derdî loqey girt le nakaw şêxe tuhmetkareke
Ew qeyafet hîzekey hey'et weku kemtiyarek e

Qox wehay lê kird le cêy qox kaşkî poxî dexward
Şêxekey demçewtekey liçgêrrekey lêwxwareke

Kurde bênamûsekey gorane qurrimsaxekey
Hîzekey, bêdînekey, kerbabekey, bê 'areke

## — 55 —
## Waqewaqî dill

Waqewaqî dillm e be destî fîraqewe
Wek rêwî ke herdû gunî bê be faqewe

Îman le tewqî sermewe wek waşe derperrî
Simtî ke derperrand û serî na be taqewe

Mutrîb le 'eşqî yarî 'êraqî be hesretim
Bom heste wirde wirde le perdey 'êraqewe

## — 56 —
## Wîlayetî Bexda

Ger billêm Bexda le cennet xoştir e hêşta kem e
Çunke suknay Xews û Kerxî û Îmamî 'Ezem e

Ey birader şarî Bexda bê hesadet bê heme
Zor emîn be lem hîsabe pêt billêm kurt e û kem e

Bo wîlayet hîç willatê herweku Bexda nîye
Hakimî 'edl û 'edalet zor emîn û bêxem e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 57 —
## Mestî Efendî

Lêre gayan jinekey Mestî Efendî be sere
Êste bo Besre deçê beʻde xerabîl Besre

Hênde gewad e ger ewladî le pêş çawî bgêy
Rîşî radegirê ke ha kêr û gunî pê bisrre

Eynî Bexdadî ye be xoy çunke le ber awî menî
Meqʻedî behr e, gunî qayix e, kêrî cîsr e

## — 58 —
## Berxe nêrê

Qewmekan bew zate wa hukmî le ser behr û berr e
Berxe nêrê ger nenêrê her kesê xawen merr e
Dêm be gijya eydirrim ger fîl mîslî şêrî nerr e
Ba neqewmêt û nezanin em hemû şorr û şerr e
Gişt le ser berxî şel û kawirrî lerr û biznî gerr e

## — 59 —

Be Marif Beg billên qetʻî miʻaşî min neka çak e
Zimanî min ke bo eʻda weku marêkî zuhhak e

Hîca mezmûm e tu Xua lêm gerrên ba tobe neşkênim
Wela tulqû bî eydîkum xerez bo defʻî îhlak e

Meʻaşî mangî kanûn û şubatim tabekey nada
Ke azarî Reza ʻeynî simûm tehsîlî tiryak e

## — 60 —

Ya herfî nîda ye ehmeq terxîm e
Munaday mefʻul meʻrîfey mîm e

Ker û mekteblî herdû mef'ul in
Fî'l û fa'ilî herdû mechul in

Hîmar le herhall ew salle û sall e
Bellam mekteblî da'îm be fall e

**— 61 —**

Bed e ab û heway Qel'edize
Ke segîşî le 'umrî xoy werriz e

Milî ehlî le ber lerrî û çirçî
Herweku kêrî pîrî pişt le kuz e

**— 62 —**

To ke xot meylî cinêwbazî dekey Şêx Salih
Bo dekey serzeniştî min ke Reza heccaw e

Xayetî bende, cinêwim be dû sê kes dabê
To heta êsta be qurban be hezarit dawe

**— 63 —**

Hemey Westa Fetah sed barekellla lem ser û rîşe
Ke giwêdirêjê be tenha çon eba em bare qamîşe

Le sed batman xurî ziyatir nebî kemtir nîye weznî
Serit çonî hellegrî min serim surrmaw e lem îşe

**— 64 —**

Şêx Reza pîr bûwe rûy meclîsî yaranî nîye
Taqetî keşmekeş û gerdişî şaranî nîye

Des be goçan degerrê êste le ber zî'fî wicûd
Metreqe ser zilekey qiwetî caranî nîye

## — 65 —

Pîrîy be tenya rehmet e
Pîrî û feqîrî zehmet e

Pîrêkî wa gewrem heye
Derheq be min kem hîmmet e

## — 66 —

Şêx Mustefa le zimrey ewladî Murteza ye
Her kes ke xesmî ew bê deygêm lelam xeza ye

Hacî Resullî Zade mefʿulî Şêx Reza ye
Reza be narezayî wek marî bêreza ye

## — 67 —

Pîr ke kokî û netirrî dûr e le mirdin hêşta
Wirde ahengî diway koke nîşaney ecel e

Pîr ke kokî û tirrî dengî wek bare zele
Şahîdî muʿteberim Îzzetî meʿmûrî tel e

## — 68 —

Ew mirîşk û kelleşêre ke witim bînêre
Dûy le rê mird û yekêkî be nexoşî lêre

Şew hemû des be duʿa bûyn le wextî sehera
Kelleşêr emrî Xuday kird û witim way şêr e

## — 69 —

Her kesê nawî Mela Ezîz e
Bin gunî dayim be gîzegîz e

Be xoy gewwad û jinekey hîz e
Xwardinî gû we û şerbetî mîz e

**— 70 —**

Dewrî Wesman Beg le Koye jin nema neygên bebe
Nîsbetî Koye legell min nîsbetî îbne û eb e

Elxerez sozanî û zanî le koyî çatir in
Muxteser çak e qise, kûnî be, koyî mebe

**— 71 —**

Bûm be mîwanî Se‘îd Axay Wêlle
Her binî naxûnêkî sed fêll e

Le ser û sûretî ‘eceb mawim
Em qurrimsaxe gemall e ya dêll e

**— 72 —**

## Bo Şêx Elî biray

Fermûte: Îctînab bike lew cenabete
Şêxim eger bizanî cenabete cenabte

Pîr bûy û terkî reûresmî kodekît nekird
Herwa ezanî ewwellî ‘ehdî şebabet e

**— 73 —**

Le xew hestawim xwar bû giwêzebane
Hellî da agirî cû‘im zebane

Dehat dengî tirrim herwek terane
Sehergahan ke mexmûrîy şebane


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 74 —**

Toyş le min bûgî we şa'îr ey heramzadey Sine
Bo çe şanê nahefênî mesref çes ewtinê
Îzzet ahengî le kiwê bû ey kurrî Westa Şefê
Wirde ahengê ke fermût hawelay westajin e

**— 75 —**

## Wellamî Westa Şefê

Şahim şî'rî xot wergire kemdemax û serserî
Eger min gewwadî Sinem to puşt û gewwad û kerî

**— 76 —**

## Şêx Homer

Her le nakaw zirmeyek hat, kêy kurre? Şêx Homer e
Şêxî çî mirdût mirê, bo çî netgut caşeker e!

**— 77 —**

Muxbîr xeberî dawe le ser muftîy Koye
Hesretkeşî şîrî seg e bo kewçke doye

**— 78 —**

To be tîrî 'işqî şoxê cergî pêkawit heye
Naw zikit mecrûh e boye zerdelîkawit heye

**— 79 —**

Lûtî wek memkekenû, çawî dellêy kunge bûwe
Bedfesallî weku Nûrî, ne debêt û ne bûwe

**— 80 —**

Her kesê esll û mîzacî fîtneyî û bedgoyî ye
Destî hîzîşî hebê emca be tehqîq koyî ye

**— 81 —**

Le tirsî afretekanî emêste waqî wirr e
Hisên Efendîy diktor ellêy mirîşkî kirr e

**— 82 —**

Şêx Hemîd gerçî qebîley ême ye
Ehmed Axay Ye'qube oxllî ême ye

**— 83 —**

Le ser şah û geda em fî'le ferz e
Kesê elfêkî bê bînê le hemze

**— 84 —**

Ax le des şorbay Sileyman Çaweş û qawey Xile
Ew dellêy awî gerrawe em dellêy newtî gil e

**— 85 —**

Hetîwî lûs û bêmûm min le 'umrî xom gelê gawe
Le semtî simtî Hemmadîm nebird, em hesretem mawe

**— 86 —**

## Hemadî wellamî edatewe

Emêsta ke debê to dûdekî bî lade lêm ya Şêx
Birro şexsê peyake bîkutête bin gunanit mêx

**— 87 —**

Gîr nebû destim le ber lûsî besimtî xirrtewe
Zor nemabû gerdinim bişkê be gun xom girtewe

**— 88 —**

Kurrekey Qutbe ke piştî milî dû gez pan e
Cilekey lêy be şikim min cil e ya kurtan e

**— 89 —**

Ger le namûsit etirsî hay wetengî tintewe
Wextê bo tekye eçî des bigre piştî qingtewe

**— 90 —**

## Em beytey Şêx Reza le wellamî beytêkî Westa Şefêy sineyî dawetewe ke dellêt:

Şerm ekem ya Şêx billêm hey name naw dû lingtewe
Mêkutî gewrem kutaye dollyanî dingtewe

**— 91 —**

Çend hetîw xoy tas û lûs da çûn be pîrî Şêxewe
Kaşkî mûyê bû maye min be kêrî Şêxewe

**— 92 —**

Bo kerê î'lanî herbî kird legellman Şêx Hesen
Seyrî ken yaran çi gobendêkî gêrra em kere

**— 93 —**

Min ne nanim xwarduwe emrro ne ganim kirduwe
Wek jinî serkase, yaran bo çî janim kirduwe

**— 94 —**

Şêx Elî etwarî bawkit têk mede
Qul huwe rrehmanu amenna bîh e

— 95 —

‘Eşret azaş bê ke namûsî nebê bê fayde ye
‘Eşretî bêxîret emrro ‘eşretî Dawde ye

— 96 —

Aşî simtî to be awî kêrî ême nagerrê
Aşbetallî bo bike ger taqetî danit heye

— 97 —

Hetîwî xwêrrî û mehbûbî sade
Ke destit kewt siwarî be û pîya de

— 98 —

Heramzade û dakî-xo-gê le ber tekye zor e
Xile û Bile û fişegallte û ‘Eze dembore

— 99 —

Kenyekey feqê Qadir çi re‘na û zerîf e
Be tapo hî Hemîd e, teserrufî Letîf e

— 100 —

Qametî bêşik nemamî ‘er‘er ya sewsen e
Dek fîday naz û girîşmet bim perîzadey Sine

— 101 —

Çawî ‘îbret danewênin her le surqa û şanewe
Awî sûrî ême ye errjête naw zêtanewe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 102 —**

Kake: Qadire boze
Destî şkandim be goze

**— 103 —**

Îdi‘ay ‘îlm û em ser û sekute
Sîktirî ken her beşî sokte

**— 104 —**

Hîz e her şiwênê ewwellî sîn e
Silêmanî, Seqiz, Sîtek û Sine

**— 105 —**

Te‘ecub girtimî lewey berbû lew nehsî qîrsîçme
Dû lêfey da be yek da xalle Mehmûd witî liçm e

**— 106 —**

## Şî‘rî Şêx Reza bo Mela Hemdûnî şa‘ir:

Hemdûn piyawêkî kiwêr e
Qûnî meq‘edî kêr e
Kerkûkyanî pê fêr e

**— 107 —**

## Mela Hemdûn wellamî Şêx Reza edatewe:

Şêxme mehbûbme nûrî herdû çawme
Def‘e def‘e bo teberruk lêmî megirin gawme

# Pîtî ê

**— 108 —**

## Her bilûkêkî ‘ecem

Her bilûkêkî ‘ecem hakimî xemzekene bê
Muxteser perwerşî rohî be awî Sine bê

Na‘îbî giyane billane meke bo xom egefim
Munşî başî şeketim nazirî memto qinebê

‘Eynî serkar û tifengdar e le bo rojî mesaf
Şîr û qellxan û qemey simt û surên hoce nebê

Sefî pêş xidmetî ebro be xetî wismekişaw
Dest û pêy noker û eczay hemû xerqî xene bê

Jinî ehlî Sine ye şubheyî pê nawê eger
Nirxî şew şayî yek e û şertî ser û hem bine bê

De‘wetî xan û begî şarî Sine refz e Reza
Bazyanîşî le bo sûreyî serasine bê

Namewê lezzetî ew xake cehenem le sefay
Sa dûsed mertebe wa gûy Xile lew meskene bê

## — 109 —
## Suhbetî Şêx Elî

Şêx ke ham suhbetî şamar û nedîmî Heme bê
Şêx ke dostî miçerêjawî û Ehmedî ceme bê

Şêx le ber celbî dillî Ayşe kurranîy jinekey
Şîr bikêşêt û le rûy walîde deste û qeme bê

Şêx ke qudsyetî pîranî terîqet le kinî
Hemû efsane û efsûn hemû gallte û geme bê

Şêx ke gewwadî weku xadimî succade le lay
Seyîdî hurr le sulaley Elî û Fatîme bê

Şêx ke qesrî heremî geyîye meqamî ‘ela
Ser billind kat û billê Şêx eme qesrî eme bê

Şêx ewa goy hunerî birdewe keşkek sellewat
Şêx ewa cêy piderî girtewe destî beme bê

## — 110 —
## Hewşekem

Hewşeyekim heye be qeder lepê
Roj ‘îlacî dekem, be şew detepê

Menfez û dirz û awdizî herçend
Deygirim, deykutim, be dest û be pê

Şew ke hat dem dekatewe wek har
Wa ezanim seg e û be min ehepê

Ser û rîşim le toz û qisll û geça
Wek pellasêk e pirr le rişk û espê

Xemî şagirdekan ziyatir exom
Gewre her çak e ax le des desupê

Jinî westake bo çi negêm tu Xua
Saq û simtlûs û kuz pirrî derpê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 111 —
## Bo çî etirsim

Derheqî bo çî etirsim be Xua ta emrê
Çî le dest nayê meger bê gunî espim bigrê

Be xebîsî nîye mîslî ke weku cewherî gû
Meger pêwe binîşê weku seg pêy dewerrê

Pêy billên bew terese ger le‘eleyîhîm bidwê
Be fûyê ‘ezlî dekem nabê le wê da bitrrê

Piderî nêreker û maderî wek maçexer e
Kê dellê amad e, kerbab e weku ker dezerrê

Were lade le şerrî aletî me‘hûdî Reza
Muqtezay girtine teb‘î be Xiwa pêt ekirrê

## — 112 —

Êstirî zîndû billêm bom çak e ya mirdûm dewê
Îhtiyacim zor e xanim ba billêm herdûm dewê

Karûbarî xom û çermî domî tiya ye xanima
Lem siwarî û yarî û cût, lew, ke yall û dûm dewê

Ba ewey pêşînî xot bê we'deyî hurr deyn e xo
Bangî pêxember le rû xoş e minîş herdûm dewê

Namewê xanim be rûtî herduwanim pê bidey
Bo sefer pêwîstime serbarî pirr têşûm dewê

Bêçûwekanim ser le sibheynê hemû dewrim deden
Ew ellê pûlim nemawe, em dellê bêçûm dewê

Ba wicûdî em hemû teklîfe gêjyan kirdûm
Kurr xeyallî jin ekat û kiç dellê min şûm dewê

Bê reza ye bo rezay Xiwa çak e neycûllênî çon
Bo miyanî herdû la îxlasekey pêşûm dewê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 113 —
## Pêncxiştekî le ser xezelêkî Mistefa Begî kurdî

Dillî birdim be naz û ‘îşwe dîsan şoxî ‘eyyarê
Firîbî dam be sîhrî çawî xoy mehbûbî sehharê
Le hîcrana teqim kird ey refîqan kiwa mededkarê
Eman mirdim ‘îlacê sa le rêy pêxembera çarê
Wîsall ya qetll ya teskîn le hersê bom biken karê

Le dewrî nêrgisî mestî kesê neymawe meylî mey
Le bo şehdî lebî le‘lî denallênê dillim wek ney
Le tabî ateşî ‘eşqî bikem dad û fîxan ta key
Ewend sûtawim eslla tabî feryadim nema sa dey
Refîqan nîwe sûtin êwe, namerd ‘erze hawarê

Le rêgey ‘eşiq da nayane pêm zincîrî mecnûnî
Le destim çû rimûz û daniş û fehmî felatûnî
Weku şexsê ke zarî ka le cewrî dujminî xûnî
Le kuncî sîne dengî ay û oy dill dê be mehzûnî
Wêran bê nemdî satê lêy neyê nalley birîndarê

Ke çawî sahîrî destî be xemze û naz û îma kird
Meta‘î ‘eqll û hoş û derkimî tarac û yexma kird
Kesê neygut dirêxa kê etoy wa şêt û şeyda kird
Elay herkes deçim men‘im deka xot bo çî rîswa kird
Dirêx kuwa hallzanê rebbî tûşim bênî bîmarê

Gutim wek surme ye bo çawî aşiq xakekey jêr pêt
Le ulkey husin da ger lafî şahî lê bidey lêt dêt
Gutî meyxane bê dayim be yadî çawî mestim cêt
Seba yaranî meclîs ger hewallî min bipirsin lêt
Billê kêşaye meyxane dû çawî bêçwe eyyarê

Serî cengî heye dayim legell min çerxî dûnperwer
Ne bextim yar ne çerxim yawer û ne tali'im rehber
Ewend bêrehm û sahêbkîne ye derheq be min dulber
Le nez'a pêy ellêm qurban cefa bes ye dellê kafir
Erê çît dîge to segmerg karim mage pêt carê

Nemawe rewneqî bazarrî 'eqll û daniş û wirdî
Be pûlê naykirrin lew esre da 'îlmî edebî werdî
Le eş'arî Reza peyda ye asarî ciwanmerdî
Durr û yaqût debarê lem kelamî şîrînî kurdî
Xiwa sakwa le dinya da qedirzan û xirîdarê

**— 114 —**

Şoxê be înabet çûwe lay zuhdfiroşê
Bo exzî terîqet be dillî pirr le xiroşê

Xoş hate cewab û witî: To heqte welê min
Sallêk e firoştûme îmanim be qiroşê

**— 115 —**

Hemîn nanewa û Xecê aşpez bê
Yabe legellman wa be xerez bê
Ebê Şêx Reza le birsa bimrê
Legell Şêx Elî her be duxez bê

**— 116 —**

We'dey min û to ey Remezan rojî ceza bê
Şer'î min û to ba le hizûr barî Xuda bê
Em lale ruxane hemû rengzerdî destî ton
Kê dîwye şeqayiq yereqanî be sera bê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**—117—**

Zubdey meta'î hîkmet e em şî'rî kurdîye
Herzan e bê mubalex e herfî be gewherê

Camey heyatî 'aryet kurt e zînhar
Alûde damenî meke bo pêçî mêzerê

**— 118 —**

Bo nîşaney kuz biçûkî bêt û dem nîşane bê
Ehlî em şare kuzî kiçyan ebê zengiyane bê

Çawî mehzûm kiz e lem sirre naga 'aciz e
Bêt û ger wa bê nisîbî em xirrey serpane bê

**— 119 —**

Lam wa bû pîrim bûm eşiq destim lê hellegirê
Nemzanî darî wişik baştir agir egirê

**— 120 —**

Le sayey dehrî dûnperwer emêste lek le lek edwê
Be kollê kilkewe rêwî legell kewllî dellek edwê

**— 121 —**

Sax le dinya da nemawe ger qisey saxit dewê
Bê hezarit pê nîşan dem ger qurrimsaxit dewê

**— 122 —**

Xwastim le kurrî Hacî Bekir konedûkanê
Bo tecrube neyda be min day be diyanê

**—123—**

‘Umerim dî ‘Umerî pêşûtirîş ger wa bê
Gerdinî şî‘e dûsed def‘e le seb aza bê

**—124—**

Regî kêrha le guna her gun e ey biziwênê
Meseley koneseg êsqan be kilk eşkênê

**—125—**

Seyr ke zibill esllî gû e û gull errwênê
Bawkî wek Emîn boqe kurrî wek ‘Ebe dênê

**—126—**

Serdarî leşkir eger bawel bê
Kêrim be qingî desa ba wel bê

**—127—**

Çermî rûy hênd qayim e şimşêrî mîsrî naybirrê
Ger be kewşî key demênê ta qiyamet nadirrê

**—128—**

Muxbîr xeberî dawe le ser muftî Koyê
Hesretkeşî şîrî seg e bo kewçke doyê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî î

## — 129 —
## Kelleşêrî kirmaşanî

Kelleşêrê be Reza lazim e kirmaşanî
Zîrek û çabuk û demgerm û dirr û şerranî

Kelleşêrê ke qepî girt le bina giwêy kelleşêr
Pirr be dem bîpiçrrê wek segî hewramanî

Kelleşêrê ke eger şêrî nerrî bête mesaf
Ray rifênê be şeqê mîslî kerî tallanî

Bo hewalley dubrî ew kese xom eyzanim
Dû gunî pêwe hebê wek dû cerrey leylanî

Be dirêjî weku mewlan begekey mîrî beyat
Be cesamet weku kiwêxa zilekey bîbanî

Cînsî xoy cûte mirîşkê berî hemley bigrê
Neku siwêy bêtewe bêçare le ber bêganî

Ey Neqîbzade binêre kelleşêrêkî weha
Bo Rezakey segekey qapiyekey Geylanî

## — 130 —
## Stayişî kak Ehmedî Şêx

Merbût e heyatim be Suleymanî û xakî
Xozgem be segî qapiyekey Ehmedî kakî

Ew qudwetî sadat e ke sukkanî semawat
Şerryane le ser secde le ber merqedî pakî

Ew merqedî wallaye ke wek ‘erşî mu‘ella
Mehfûz e be ziwwarî melek dewrî şubakî

Bo dest û ‘esa nazgekey, dax e derûnim
Qurbanî ‘esay destî bim sol û sîwakî

Dunya le diway hezretî Şêx jêr û zeber bê
Wek tacî Key û camî Cem û textî Zuhakî

Derheq be hefîdanî edeb lazim e zînhar
Qurbanî hefîdanî de bim babîy û dakî

Bem halle perêşanewe baz eşhedu bîlla
Şî‘rit tereb engêz e Reza şa‘irî çakî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 131 —
## Şerrî Cebarî û Dawide û Kakeyî legell Tallebanî

‘Eşayir bûn be yek ta rîşeman derken be yekcarî
Cebarî û dawide û kakeyîyekanî daye Rêzwarî

Qesemyan xward be rohî Sey birake û gorrî Xan Ehmed
Be kelley xûg û şaxî gawî hol û goştî mirdarî

Debê emrro be carê qet‘î neslî Tallebanî keyn
Teq û toqyan ke hesta gulle herwek terze dabarî

Siwarey tallebanî derperrîn wek Rostemî destan
Fîraryan îxtiyar kird seydekanî bawe yadgarî

Fîrarî kakeyî her neyse, emma giwêy felek kerr bû
Le cirt û firtî Axay Dawide û sadatî cebarî

## — 132 —
## Biraza ‘ezîzekem

Rûm kirde bezmî xasî biraza ‘ezîzekem
Emşew be sed tewazu‘ û îxlas û serkizî

Riwanîm le dirzî qapîyewe xoy û tabî‘an
Danîştibûn dû rîze le dewrî xiley kizî

Detwit temê kirabû be mehsûsî qapîyewan
Xoy kird be nêreturk û witî: Kîm bîlîr sizî?

Pêm wit: Minim fillane kesim, mame Şêx Rezaim
Tanimazmisin Xemîs efendî meger bîzî?

Em seddî babe bo mine îzharî ke ta birrom
Yan merhemet ke hîze le serma gunim tezî

Emca be kurdî hate tekellum witî bellê
Ke Şêx e hîlebazekanî qumarbaz û kerdizî

Wextê ke lem me‘amele zanîm xerez çî ye
Derhall gerrame paşewe emma be ‘aczî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 133 —
## Mayînekey kiwêxa Elî

Kê çu zanê koçelley simtî şikawe ya milî
Wa le hallî helwela mayinekey koyxa Elî

Çûm bizanim mawe ya xo miduwe wextê ke dîm
Şademarî sist e nabizwê regî qaç û qulî

Dam be ser xom da gutim wa hesreta bo mayne kiwêt
Dek be mîratim kewê desbend û hewsar û cilî

Nebz û qarûrey eger sed car temaşaka hekîm
Derdî nazanê çî ye ta ku neka bonî silî

Ger Îmamî ‘Eskerî niwêjî le ser ka layiq e
Çunke muştaq e be wesllî nallekanî çiwarpelî

Kesrî enfî dujminan û cebrî kesrî dostan
Her bimênê çak e be Xua Şêx Reza û kêrî zilî

## — 134 —

Em dexlle ke teslîmî deka Şêx be hecîcî
Nuqsanî dekat her le texarê de kewîcî
Esll û nesebit dom e le min bûy be hecîcî
Bê mirwet û însaf û heramzade û bîcî

## —135—

Be bê min siwênd biden sinduqemînî
Beayin û beerkan û bedîn î

Le ‘ehdî gîflîyewe hetaku êsta
Be herdû çawî xoy çend carî bînî

Le simtî pirr berê heytare gewrem
Le singî têperrî ta geyîye bînî

## — 136 —

Hacî ‘Ebdullla le Adem fîltir e
Ba wicûdî mertebey pêxemberî

Em be sed şeytan le Koye derneçû
Ew be şeytanê le cennet derperrî

## — 137 —

Xadîmî succadeyî pêxember î
Keştî cûd û sexara lenger î

Exniya xwahend ez en‘amî tu
Sînî şekraw û pillaw dû lengerî

Ew kesey xwanî le bo dê subh û şam
Çî le ême ziyatir e xeyrezker î



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 138 —**

Xaneqa, tewbe le Seyid Ehmed û nan û xwanî
Le te‘amî şelem û bamiye û bayincanî

**— 139 —**

Qazî re’îsî ewwell, toş mudde‘î ‘umûmî
Em kare çon ser egirê le‘net le babî romî

**— 140 —**

Meken bawerr be qewlî dakî-xo-gêkanî kerkûkî
Eger xelletî biken wa bizane gaqorranî, ker kokî

**— 141 —**

Diwênê qetreyê xwên bûyt û emrroke kefî xakî
Benîadem kerî, ger ker nebî bo çi hênde bêbak î

**— 142 —**

Le sûrey serxirrim agir debarî
Kutame jêr gunî Axay Cebarî

**— 143 —**

Weha meşhûr bûwe beynel ehalî
Hetîwî tekyekey xoman e walî

**— 144 —**

Wesman Hebeş û Hemeşîn û Ehmedî Hacî
Dem dem dewerrin wek seg û tûle û tancî

**— 145 —**

Musullmanan, musullmanan, musullmanî, musullmanî
Hetîwêkim ewê xellkî Suleymanî, Suleymanî

**— 146 —**

Awazî tirrî bonî tisî Hemze hîmarî
Afaqî hemû girtuwe, wek hewrî beharî

**— 147 —**

Der cihan her ke mîşud babî
Metreqî ker be meq'edî babî

**— 148 —**

Be cê ma kake Caf xoy û killawî
Derî kird aferîn Xidrî gillawî

**— 149 —**

Me'denî gewherî suxindanî
Menem û Fazîl Merîwanî

**—150 —**

Ne to her pêşî murîdan çu şekerşîrîn î
Be Xuda ey piserî Şêx to her caşeker î

**— 151 —**

Her le tom bîstuwe ey kiwêrî le Yezdan 'asî
Zîkr û tehlîle be Xurşîd û Ella Weysî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 152 —

Ba cerde bîba kewllekey Nacî
Behar hat cilî pê nawê tancî

## — 153 —

Wam ezanî êwe sadat in me‘aştan nabirrin
Daxî daxanim cebarî xo le êweşyan birrî

# Pîtî k

**— 154 —**

Bem halle eger def‘eyetir biçmewe Kerkûk
Me‘lûm e be merdî nerwawe le serim tûk

Boç biçmewe Kerkûkî qurrimsax ke legell min
Ehlî hemû nasaz e weku awî hemamûk

Pêm xoş e le ber cewrî bira û lomey eqwam
Sed car le xerîbî bikewim muflîs û meflûk

Rojê be miradî minîş ellbet degerrê çerx
Em mîçe qerarî nîye gahê cik e geh bûk

Şahî ke nebê radebiwêrîn be feqîrî
Bo ehlî qena‘et le pillaw xoştir e dandûk

Şeş mang e ziyatir ke le paş mergî pider min
Mexdûr û mezllûm û cefadîde û mehtûk

Ta sakinî Koyê mame xefûrim weku Xefûr
Kîsem pirr e dayim le zerr û lîrey meskûk

**— 155 —**

Ser be yeşmaxî şirr û şaqellî çillkin mehtûk
Sûrr exon serxoş û rîswa be qoryat û netûk
Têgeyiştin ke melayan çen billêy to be wezin sûk
Kebabî goştî bizin fakîhey berî xirrnûk
Le min bipirse sefay şare hîzekey Kerkûk

## — 156 —

Le bextun nesrewe gandan e pîşey ehlî Kerkûk
Ke ennas ‘ela dînîl milûkî leyse metrûk

# Pîtî I

**— 157 —**

Her meta'ê ke telleb key le Suleymanî da
Heye îlla kuzî bîkr û kunî namuste'mel

# Pîtî m

**— 158 —**

Ba nekem hecwî hîmarî regî cergî bibrrim
Herweku cawî neşoraw kuzî daykî bidrrim

Şehuwetim hatote cunbuş weku deryay ‘Umman
Lazim e maçekerê mîslî hîmarî bikrrim

**— 159 —**

Gerçî feqîr û muflîs e mame Şêx Sallihim
Nemdî kesê weku ew sahêbî kerem

Mîwanî bûm nan û kerey naye ber demim
Êstaş be bê mudahene memnûnî ew kerem

**— 160 —**

Bem cûte guney min ke dellêy ‘enterî nêr im
Lêm lade newek bitxeme ber hemleyî kêrim

**— 161 —**

Tirrî ewladî em esre be kêrim
Ke min mirdim meger gû biken be xêrim

**— 162 —**

Mudetêk e nêrbazî û êste meylî mê dekem
Arezûy ganî kiçêkî kuz pirrî derpê dekem

**— 163 —**

Muxalefem nîye min saʿetêkî mîqat im
Xulamî helqe be guşî cemîʿî sadatim

**— 164 —**

Em qehbe felek le daxî mirdim
Muhtacî reşî Reşîdî kirdim

**— 165 —**

Gelê simtî spîm des kewt û nemtiwanî piya kêşim
Dirêx bo mîtraqî kêrekey çend sall lemew pêşim

**— 166 —**

Şanazî ekeyt kewa min guntim
Bellê min be roj têbirrî kuntim
Şew ta beyanîş des le mil jintim

**— 167 —**

Hênd be teʿrîf û kînayet le binî singit bem
Beg efendî be serahet le kunî qingit bem

**— 168 —**

Necabet key le to da ye le dû çallî çetîwit bem
Hemey tullîne bem tûlle le tûllîney hetîwit bem

**— 169 —**

Esbabî tereb zîr û bem e, ey begî Cafan
Bezmê bigrîn çak e, le min zîr û le to bem

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 170 —

Ya resulellah dezanî to ke şeytan e ‘eduwit
Hem le to me‘lûm e xo min ummetî tom herçî hem

Key rewa ye serwera, bo to ke xeyrul enbîyay
Duşminî xot şad bikeyt ummetîşit dillbexem

## — 171 —

Mame Hemey bê lût û fem
Le ser qingit birrawe dem
Le babî babî babit bem
Estexfîrullahel ‘ezîm

## — 172 —

Mela ‘Ebasî Îmam Qasim
Min bo çî to çak nanasim

# Pîtî n

## — 173 —
## Alî Bebe

Sa'îl bexîna, na'îl eka, bexşişî kemtan
Alî Baban ya Xuwa nerizê destî keremtan

Herçend be mesel xencerî ellmas e zibanim
Nabirrê serî mûyê le eday şukrî nî'emtan

Gîrfanî geday kirduwete kanî cewahîr
Êksîrî nîsarî zerr û şabaşî diremtan

Êwen be heqîqet melîkî mîlletî kurdan
Şayan e ziyaret bikirê xakî qedemtan

Înkarî hiqûqtan le ser em mîllete nakirê
Abayî Fereydûn, Ferr û Cemişîd e heşemtan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 174 —
## Şêx Elî Tallebanî

Bêgane hemû sahêbî cah û ceberrût in
Bêçare biray Şêx Elîy muflîs û rût in

Ey Şêx Elî çak e wisûqit be bira bê
Bawerr meke bem xellqe ke wek tûle le dût in

Qewmê ke le ‘ehdî piderit helqe begoş bûn
Tehqîqî bizane be Xuda cumle ‘edût in

Rehmyan nîye derbarey to xizm û eqarîb
Muşfîqtir e bêgane le mane ke emût in

Nadan û qurrimsax û nezanin ke emane
Gahê le sema gah le seyrî melekût in

Em tekyenişînane çi derwêş û çi sofî
Herçende be dill muştexîlî zîkr û qunût in

Wek hacî mabeynî Sefa û Merwe be te‘cîl
Bo luqme emanîş be mesel Yunis û hût in

Cum‘ane birrawe be Xua muflîs e lamî‘
Ne pûlî hemamî heye ne pareyî tûtin

## — 175 —
## Em sade ruxane

Em sade ruxane le melahet ke temam in
Dewret deden û tefre mexo qet mellê ram in

Geh dost û wefadar, gehê dujminî xwênxwar
Dillnermê debin gahu gehê sextkelam in

Aciz mebe nek bo to wefayan nîye bo kes
Me'lûm e ke em taqime wek tasî hemam in

## — 176 —

Eger berzinceyî xedrîş biken her neyse sadat in
Xidir Axay Rebatî dakî xo gê êwe bo hatin

Xezûrî Şêx Hemîd Axay Rebatîy kone qelltaxşirr
Le esll û me'dena ecdadî êwe dom û xerrat in

## — 177 —

Mutelewîn mîzacî gona gûn
Muteserîf ke dîde bû qelemûn

Muteserîf cîgarekey le dema
Dê û deçê wek mirîşkî çîlke be qûn

## — 178 —

Wextî şerr şêr in le bo dujmin
Le sîlma şîrî pak in bo xoyan

Wa bû adatî ecdadî kîramyan
Mawetewe bem core boyan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 179 —

Cewherî mehz e le herdû lawe wek tîxî deban
Dakî kiçî paşay Rewandiz babî kurrî paşay Beban

Şêx Rezaş hecûy bika î‘tbarî bo nîye
Çak xirap nabê be şî‘rî şa‘irêkî qellteban

## — 180 —

Be remz û îşare qisem pê dellê begî Cafan
Bizin qingî nexurê çî dewê le nanî şiwan

Be kêrî gewre berim min le meq‘edit ta bin
Eger qiwet bideyte xot tirrit debê be duwan

## — 181 —

Bes e em şî‘re bo wesfî husnî ehlî Beban
Segenêryan le dûn wek segemê cumle be ban

## — 182 —

Pîr bûwe Nacî Efendî bûwe piştî be keman
Çirç û jakaw û melewwes weku kêrî paş gan

## — 183 —

Busem ewê ey nîgarî nazenîn
La yuzî‘ullahu ecrel muhsînîn

## — 184 —

To hete tîxî deban û min heme tîxî ziban
Ferqî em dû tîxe herwek asman û rêsman

**— 185 —**

Ger neka mexmûr efendî terkî tiryakî le‘în
Fêrî sê nezmî deka pijmîn û kokîn û tirrîn

**— 186 —**

Hemewend leşkirî rom û ‘ecemî dawe be gan
Berî hemley çon degirê leşkirî gawan û şiwan

**— 187 —**

Xellkî ker bûn Şêx Hemîd çûn bo kirrin
Marfî zawam dê û deçê wek wişkerrin

**— 188 —**

Le her layeke rastit dî selamî lê bike qurban!
Gurîsî naw hemane pêm ellê rastî qurban

**— 189 —**

Dû canewer le nesilî canî îbin can
Emînî Hacî Kerîm û Emînî Babecan

**— 190 —**

Wam ezanî êwe sadat in me‘aştan nabirrin
Daxî daxanim Cebarî xo le êweşyan birrî

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtê o

**— 191 —**

Refîqim bû ciwanêkî Ciwanro
Ke çû mallîm be ser xom da ciwan ro

# Pîtî q

—192—

## Stayişî Şêx Star

Supay xem dewreyan dam des be metreq
Le paş teşrîfî to dayanme ber şeq

Te‘alallahu le celladî fîraqit
Derrêjê bê muhaba xwênî naheq

Mepirse bo le hîcranit nemirdim
Ke min segmergim û giyansext û dillrreq

Ke zînyan xiste ser peşt mayne reş kiwêt
Gerra çawim le tawan zerd û eblleq

Le şewqî to weku Mensûrî Hellac
Xirûsî teb‘î min eygût: enal heq

Le bezmî xesrewan da yek zemanê
Murexxes bûm weku destûrî mutlleq

Emêstaş taqetim taq e û perêşan
Xirûsim nexres e û hallim mufeşşeq

Le ber heywanî mizgewt êste bê to
Weha dêm û deçim wek hacî leqleq

Îlahî ‘umr û cahit berqerar bê
‘Eduwit sernigun bê û xot miweffeq

Simêllî Şêx Star heblul metîn e
Kelamî Şêx Reza wehyî museddeq


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 193 —**

Sed sall e renc edey hêşta rûttirî le sillq
Kêrêkî sîs û dû gunî çirç û qingêkî filq

**— 194 —**

Le geştî Şêx ewa hat hacî leqleq
Dehawêjê dû destî wek dû metreq

# Pîtî r

**— 195 —**
## Kurrêkî bulxar

Rojî yekşemme ke meşhur e be rojî pazar
Min be xar kewtime dumbalî kurrêkî bulxar

Kurr çe kurr lêwî wek laleyî hemra rengîn
Kurr çe kurr çawî weku nergisî şehla bîmar

Ehlî însaf be Xua reng e çeney bişkênê
Ger kesê bêt û bika qametî teşbîh be çinar

Le hemûy serfî nezer, simt û surînêkî hebû
Nazik û nerm û letîf mîslî tellay destewişar

Xirr û mexirût û mudewer spî û nerm û dûnîm
Herweku komelle befrê ke şeqî key be mişar

Ke be dîqqet nezerim kirde sûrên û kefellî
Herdû çawim perrîye tewqî serim wek segî har

Damenim girt û witim: Merhemet êt ellmasim
Boyle yandirme benî ateşî işqin êle zar

Çeşmî cadûyî sîyahit Heme bendest û firîb
Heme nazest û girîşme Heme xwa best û xumar

Benî sedîd êtdî senin dîdeyî ahu rewşin
Ey senin dîdelerin ahuekey şêrî şikar

Sa‘etêk çak le ser û sûretî nehsim fikrî
Pêy witim: Gêt îşte hacî bebe yaxme mî war

Saçme laqirdîlerin haslî yuq aqçe gêtir
Aqçesiz êtme saqin arezûy bos û kenar

Min ke yek parey cilqim le ezel şik nedebird
Pêm wit: Îşte kemerimde dolîdir yuz dînar

Soyledim çeşmî heqaretle bene baqme gozim
Merdumî kîn meşew ez merdûmî merdûm azar

Ben buyûg zatî şerîfem wekela xwacesîyem
Ganîwr bendenizî cumleyî şah u xunkar

Elxerez hênde dirom kird û fisûnim bo xwênd
Kewte dûm herweku dûy gurg kewê berxî hejar

Muxteser xoş e qise birdme menzillgehî xom
Girtim û xistim û lêm bird û gunim kird be çiwar

Molletim satê neda ew şewe ta wextî seher
Karî xêrim be mezende guzerî kird le hezar

Wextî sibeynê ke dawênî felek etlesî bû
Her le cê rastewe bû damenî girtim weku xar

Çingî wek pencey şahîn le yeqem qayim kird
Destî kirde cez‘ û nallew û hawar hawar

Zeftiye û ehlî mehelle hemû cem bûn le serim
Pirsiyan mal xeber ey zahîdî salûsşî‘ar

Pêm witin: Lem kurre bulxare bipirsin ke le min
Çî dewê? Bo çî denallênê weku hewrî behar

Çakî kerd perdeyî namûsî witî: Sîktî benî
Wêrmedî pare benî boyle mî qanûnî kîbar

Dêdler Hacî efendî çuçuqin heqinî wêr
Sirr ke faş odî deha faide îtmez înkar

Yuqse pare eger muhletin uç gûn olsun
Heqinî uç gonder wêrmeyesin ey xeddar


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## — 196 —
## Stayişî Ehmed Paşay Baban

Eme sê roj e ke sergeşte û heyran degerrêm
Kêm heye xeyrî welî nî‘metî ferxunde şî‘ar

Ye‘nî hem namî nebî hezretî Ehmed Paşa
Fexrî dîn kanî heya behrî kerem kohî wîqar

Medhî îhsanî bikem, hîlmî bikem, ‘edlî bikem
Be Xua xaric e ewsafî hemîdey le şumar

Kefî zerrbexşî kewa menbe‘î durr û gewher e
Mîslî behrêk e ne sahilî bêt û ne kenar

Teb‘î cewad û kerîm herweku Qa‘anî dellê
Zer bê qentar hemî bexşed û uştir bê qetar

Ta weku dewr bikat û bigerrê çerx û felek
Ta weku dêt û deçê bêt û biçê leyl û nehar

Be miradî bigerrê şems û qemer çerx û felek
Zefer û fethî qerîn bextî mu‘în talî‘î yar

Re‘îy ew ba‘îsî tenzîmî umûrat e welê
Bo kurey ‘alemî îmkan bûwete qutbî medar

## — 197 —
## Azayî eşretî Tallebanî

Barekella aferîn ey eşretî nesretşî‘ar
Merdî meydan şêrî cengawer huzebrî karzar

Çiwar eşîret Kakeyî û Wend û Cebarî û Dawde
Îtîfaqyan kird û hatin çiwarsed û penca siwar

Her be ewell hemle çendtan kuşt û çendtan ser birrî
Çend kelakyan lê be cê ma bûne ge‘mî mûr û mar

Êstekeş lew deşte şerryan e le ser laşey rizîw
Kerges û şahîn û gurg û mamerêwî û kemtiyar

Beynî beynella ‘Ubeydî fîleten karêkî kird
Hîç kesêk nayka meger Heyder be zebrî Zulfeqar

Her siwarê fîrqeyekî rarifand û daye pêş
Kewte ser kiwêxa mexul ‘Ebdlwehabî namdar

Lêy xurrî wek şêrî xerran: Sa merro raweste bom
Ey tillîşî daye Rêzwarit be rîşî yadgar

Çekmeyê sûrî le pê dabû be carê zerdî kird
Tis le milyon têperrî kird tirr geyişte sedhezar

Yek le yek azatir in te‘rîfî kamêktan bikem
Dek fîday dest û tifengtan bim sulaley Şêx Star

Şasiwarêkî weku toman hebê bakman çî ye
Toş le heqqet da siwarêkî weku Esfendiyar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Em qisane gişt mecaz in ger heqîqettan dewê
Bezlî nan û hîmetî pîrane botan kewte kar

Ca'îzem metllub e em medhem be xorrayî nîye
Hurtumanîş bê Rezam, ger hîç nenêrin ya star

## — 198 —
## Hetîwêkî sineyî

Diwênê şew bo def'î hacet çûme hemamî Xefûr
Saderûwêkî tîya bû simt û saqî wek bilûr

Desbecê herwek muhendîs dame ber medî nezer
Her le tewqî seryewe ta nûkî pencey xwar û jûr

Çon be hesret gurgî birsî seyrî dûgî merr bika
Semtî simtîm girte çaw û têy defikrîm dûr be dûr

Aqîbet şewq û hewes perdey hîcabî pare kird
Xom kuta dêwane asa bo sera perdey huzûr

Her ke fermûy "Merdumî şarî Sinem", yar babil im
Hate gerdiş bê tewequf wek 'emûdî lendehûr

Lêk geyiştîn her le ewwell firseta çûyne xela
Têm kuta û hênam û birdim ta ku jarim kirde jûr

Aferim Westa Şefê bo xot û neslêkî hete
Rebî awa bê Sine dûr bê le afat û kudûr


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 199 —
# Wellamî Westa Şefêy sineyî bo Şêx Reza

Bem çenebazîte tehqîq e ke zor dûrî le nûr
Qet be rûsûrî le dîwanî Xuda naçye huzûr

Bew şerîkî pakî şeytanîte layiq dozexî
To le ehlî enbiya û ewliyayan dûrî dûr

Bedrewiştîy xo dekeyte xulqî xelqî pirr gunah
Tewqî le‘net bo dexeyte gerdinî xot ey kefûr

## — 200 —
## Hecûy Kakeyî

Baban başinde bîr batman yeşîl war
Îmamul qewmî fî teqsîmî Şelwar

Hetane herweku bîstûme bezmê
Le sallêka şewî yaranî dîndar

‘Emûdêkim heye wek tûllî Dawid
Kutame jêrî kurrekey daye Rêzwar

Tisêkî kend be rîşî seyîd birake
Tirrêkî da be yadî bawe yadgar

Debestin helqeyî wek eqdî perwîn
Le cêgayekî xallî leyset diyar

Be çoka dê qutey mil nêrke kardû
Weku bulbul dexwênê we‘z û guftar

Dexwênê mersîyey Malosî merhûm
Yekaney gunreş û gaholî şaxdar

Weku baran be kilkî pîreseg da
Be rîşî dadeçorrê eşkî xun bar

Le paş îkmalî resm û matem û şîn
Werrîn des pê deka wek kelbî hewşar

Me‘azellahî dellê ya eyyuhel qewm
Diro ye heşr û neşr û cennet û nar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le giwê megrin qisey axunî şî‘e
Be aşûbin melay ser linge destarr

Xerez lem cirt û firt û fak û fîke
Îta‘ey eşqiya ye û def‘î eşrar

Hululî mezhebêk e bêgirê û qort
Tenasux rêgeyek e rast û hemwar

Bî hemdîllahî nema kak Ehmedî Şêx
Zehawî mird û gorrî gum bû çawmar

Eger bê Şêx Elîş def‘ul bela bê
Îtir dinya debête ‘eynî gullzar

Bimênê ya nemênê çî le des dê
Be tenha Şêx Rezakey herzeguftar

Eger mişte û mişarîş bê zimanî
‘Elac ekrê be miştî pirr le dînar

Be dînarî ‘elac ken ya be simtî
Bilûrînî kurrêkî saderuxsar

Ezîzan mezhebî yaranî cem cem
Le ser sê rukn e ewwel terkî azar

Duwem îkramî çîf û şertî salis
Le herdû ‘umdetir kîtmanî esrar

Emaneş cumle peşm in eslî meqsed
Çiwar pêt billêm ey pîrî huşyar

Şkistey cewz û tûllî sewz û kelbey
Berazî boz û kelley xûkî mirdar

Eger derçê le ser em dîne ruhit
Deçête qalibêkî şox û nazdar

Ze'îf bê Xua nexwaste î'tîqadit
Be ayîn û be erkan û be etwar

Nekey tersê be rîşî xelfe bapîr
Nedey ganê le rêgey bawe yadgar

Şîyakey gawe hol negirî le rîşit
Neçîte jêr kullînî daye Rêzwar

Qepozit danepoşê ber simêllit
Be ser milta neyê wek ballî kemtyar

Le qebîley Mistefa rû werinegêrrê
Le rêgey şeri' da demrê gunahkar

Le peşmî rîxnakî ber simêllit
Nerrêsin serkele û destbend û hewsar

Ke mirdî rohî napakit be çustî
Le însanî deçête şikllî segsar

Werin yaran şewî mî'ad e emşew
Le pê derpê firrê den xizm û exyar

Şerwallî zerd û sûr wek xermenî gull
Le ser mafûrî zerr roy ken be xerwar

Şerwallî xamek û zerbeft û xara
Le ser yek daybinên wek mallî tuccar

Kenîz û xanim û xatûn û xadim
Feqîr û mun'îm û derwêş û salar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Nedîm û noker û axa û efendî
Le dewrî danîşin wek xettî pergar

Le nezmî bezmî cem saqî bigêrrê
Şerab û lê bida mutrîb le mizmar

Nebîz û şerbet û nuqll û meze û ney
Def û tembûr û saz û berbût û tar

Debê em bezme her bem nezime birrwa
Heta dû hisse rabûrê le şewgar

Ke dinya bû be rûy qeymasî zengî
Serey beşkirdinî şellwar e emcar

Be qur‘ey me‘delet yekyek beşî ken
Mepirsin le eqreba û qewm û kes û kar

Mepirsin dayik û pûr û xuşk û xwarza
Le jêr kurkey berin bê qewl û guftar

Be qewlî bawe bawe û mîre mîre
Mîsalî kêr û kuz herwek kun û mar

Be şer‘î Mezdek û ayînî Babek
Dixulî cayîz e esmê kunadar

Fe ya sadetî lîl lût wel nîkî
Leqed ‘llemtukum teqsîme Şilwar

Çira pif lê ken û şêrane hestin
Şeqê hellden le perdey ‘îsmet û ‘ar

Ser û derpê berin bê ferq û temîz
Demûdest sahîbî derpê biken diyar

Şerwallî herkesê ber herkesê kewt
Îtir ferqî neka bîgrête ber kar

Ke em wez'ey tewaw kird pîreaxun
Îtir her pif le şem'e û tif le heytar

Îtir her etkî dîn û kesrî namûs
Îtir her terkî şerm û îffet û 'ar

Îtir her ling ebête lam elif la
Îtir her kêr ebête baskî Hawar

Îtir her gûmezî simte esûrrê
Be sûrey ser xirra wek çerxî dewwar

Îtir her lêperrîne û lêxurrîne
Berew jûr û berew jêr û berew xwar

Îtir her dayke pîre û hell'enîşê
Be kelley kêrewe wek wirçî serdar

Îtir her pawaney zîwe û zirrey dê
Le ber kut pêwedan exşê le dîwar

Îtir her xepley kuze wek çawî kazir
Be metreq deykutin sadatî ebrar

Îtir her nawgellî xubanî bîkre
Le xwêna sûr debê wek bergî gullnar

Îtir her kêre wek peykanî goştîn
Be jêr binya deçê wek perrî sûfar

Îtir Xua nesîbî duşminit bê
Birînî nêze û nûzey birîndar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Minallî lew şewe peyda bê layan
Debête seyîd û rêzdarî muxtar

Le wesfî Kakeyî ger serfî ‘umrim
Bikem nakem beyanî ‘uşrî mî‘şar

## — 201 —
## Hecûy Tallebanî

Tallebanî zor in emma her duwanyan dêne kar
Rojî de'wa Şêx Hemîd û rojî helwa Şêx Star

Qal e mil hîzî piyawî û qal e mil sîsî kurrî
Rast û çepyan girtuwe wek Rostem û Esfendiyar

Her ke wityan ceng e emro çaw egêrrin bo kullên
Em debête mame rêwî û ew debête kemtîyar

Şêx Elî xo to minit aware kird û derbeder
Çak e hecwêkit bikem mufîd û muxteser

Bo Hemey Westa Fetah êmet hemû aware kird
Ey Hemey Westa Fetah daykit be kêrî nêreker


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**— 202 —**

Şêx Rezam û be fesahet le cîhan da meşhûr
Piserî pîrî nezer kirdeyî qutbî lahûr

Şî'rî min wehbî ye kesbî nîye huşyarewe be
Xot le min lade le soraxî qingit bem Mexûr

**— 203 —**

Hemewendî terr û tûşî le cîhan derçû be xar
Êste kiwêxa dûmellane hellî dawe le binar

**— 204 —**

Serpetî xoy lê petî kird ta Miwanî naye ser
Qûllerreş hêndey wişî ta awî lê hênaye der

**— 205 —**

## Bo Mam Resûll Siyamensûrî

Aferim Resûll newey şalyar
Sefray quzşkên wek kêr kalyar

Karwaney kêrit le 'am meşhûr e
Kêriit be cê kêr gişt Siyamensûr e

# Pîtî s

**— 206 —**

Kesê bîbê heya û şerm û namûs
Ebed naka refîqî taqimî lûs

Eger sed sall bidey renc û neyangêy
Qisey wat pê dellên neygirtibê qamûs

# Pîtî ş

## — 207 —

Kêr ke hesta ne le bêgane depirsê ne le xwêş
Gurzî xoy her deweşênê çi le paş û çi le pêş

Heme kêrêkî qewî hênd be kunî tenga çûwe
Serûçawî hemû zamdar e perasûy hemû rêş

Ta milî xerq e le çerma weku sîwakî mela
Pirçî efşan e le ser piştî milî wek derwêş

Pallewanêkî qewî qoll e le mîlbazî da
Mehkem e rîşe û bêxî weku şaxî gamêş

## — 208 —

Çayekey mame Xefurim zerd e wek mîzî nexoş
Îhtiyac naka be agir her be dû tirr dête coşPîtî t

## — 209 —
## Êstirêkî rût û qût

Mîr be sed minet henardî êstirêkî rût û qût
Dest û pa sist û seqet endamî herwek ‘enkebût

Xawenî alîkî nallêm pê nedawe mutlleqa
Dawyetî emma weku bîstûme qûtî la yemût

Pûş le lay helwa ye hetta ger pelluşey çing kewê
Bay eda, lûlî eda, qûtî eda, manendî hût

Gerçî natwanê bibizwê hênd lerr û kemqiwet e
Denke coyekî nîşan dey ta qiyamet dê le dût

Piştî rîş û şanî zamdar û cedew bû na'îlac
Çend qiroşêkim hebû bom da be newt û enzerût

Sey Fetahî meyterim rojê be huccet lêy newî
Kilkî derhêna le bin emca be astem giwêy bizût

Ger qellew bê em ecinne lêre tesxîr nakirê
Xeyrî çend derwêşî reffa'î be zorî celicelû

Mesllehet wa ye heta neyxwardûm bînêrmewe
Zor etirsim def'eyê qûtim bida bimka be qût

Em meta'e çak e her layiq be Hacî Ehmed e
Cûtî pê bika herweku cût herdû lingit kird be cût

Layiqî şanî min û şayanî şe'nî to nebû
Çawekem çît pê billêm çarim nîye xeyrî sikût

— 210 —

## Texmîsî Şêx Reza le ser xezelêkî xiwace Hafîzî Şîrazî le hecûy Me‘ruf Efendî başkatibî bîdayetî Hewlêr

Me‘rufî bêdîrayet gût kirde naw bîdayet
Çît pê billêm qurrimsax herdû gunim be dayet
Gunmî be tirr şehîd kird kêrim eka rî‘ayet
Zanyar dil newazem şukrîst ba şîkayet
Ger nuktê dan îşqî xuş bişno în hîkayet

Me‘ruf ke hîzî wek ew nebû le neslî Adem
Azarî meq‘edî bû bom rakêşa le ser dem
Mirdim ewende siwar bim xom kuşt ewende piyadem
Bi muzde bu der minetê her xidmetî kê kerdem
Ya reb mubarekî sera mexdum bî înayet

Xaşakî dewrî debrî lêm bûn be marî heyca
Kêrim be sed meşeqqet royî gunim negunca
Kêrim le peşmî paşî daney kunî tirinca
Der zulfê pur şikence ey dil mepîç kanca
Serha burîdê bînî bî curm û bî cînayet

Rûm kirde semtî simtî ye‘nî mekanî me‘hûd
Erzêkî pirrnecaset deştêkî şehwet alûd
Ranîm feres çep û rast rêgem nebirde meqsûd
Ez her giriftem kê reftem cuz wehetem neyefzud
Zînhar ez în beyaban wîn rah û bî nîhayet

Derman e simtî emma nerman e wek berî dest
Karwanî kêr be nawya errwa hemîşe serbest
Her menzillêkî sed mîl her mîlê sêsedûşest
În rah bî nîhayet suret (curet) kuca tewan
Bîstekeş sed hizar menzil bibîş est ez bîdayet

Bawkî piiyawêkî çak bû zatêkî zor muqedes
Xoy puşt û dakî xo gê heta Xuda billê bes
Bo nextê awî şehwet cergî bûwe be qeqnes
Nindan tişnê leb ra nabî (abî) nemîde hend kes
Li  goyî welî şinasan reftend ez wçlayet

## — 211 —
## Katêk Me‘ruf Efendî kareke bo kabra cêbecê dekat, Şêx Reza em beyte şî‘rey bo denêrêt:

Me‘rufî pirrdirayet gullî baxî hîdayet
Çît pê billêm çawekem rehmet le bab û dayet

## — 212 —
## Hecûy mudîrî tehrîrat

Gîzer dewa’îr eqlamî erqesînde dewat
Medarî ehlî qelemder mudîrî tehrîrat
Negufte men hezer kewn zutîxî natîqe em
Fe înne natîqetî afetun mînel afat
Le ber ‘ebake cebim kirdî ey feqîrî Xuda
Ewe ‘ebakete kêrim be qingî xot û ebat

## — 213 —
## Be boney kuştinî Nasiredîn Şawe

Ehlî ‘îbret mawe ger bên ba seyrî Nasir Şa biken
Dû le sî kem şehî kird û kişêkî rê nehat
Hatî wa seyrî nehatîy ken ke sed tîp û supa
Pasewanî bû le nêw besta piyadeyê kirdî mat

## —214—
## Le hecûy Şêx Ehmed nawêka

Mizey ewende nebû aşekanî cêşanet
Bibê be qûtî şewêkit riyame cê şanet
Be bê sebeb le Silêmanî şarbeder nekrê
Nekewte destî ‘edût mektebe û kitêbxanet

## — 215 —
## Şêx Reza le hecûy Şêx Reşîdî amozaya ellêt:

Reşe reşaşî kerî reş be reşit
Ta reşit mawe reş û sûr be reşit
Çill û çêwî çemî Reşneş be reşit
Be leşit hem be beşit hem be reşit

## — 216 —

Bes e bo def'î e'da çawekem qellxanî sîmînit
Hezar martîn be qurbanî tifengî lûleçermînit

## — 217 —

Tellaq ger bê be demya ew ziley çiwarpel qewî
Boy enêrim sê zelam ta bîkene pellay qelat

## — 218 —

Espeket derkird le destim way dirêx bo espe kiwêt
Singekey mawe Kerîmxan pêm billê bîkutme kuwêt

## — 219 —

Xurûy namirêt be kêrî min tillîşî naw gellî dakit
Billêm çî sedhezar le'net le xot û şîrî napakit

## — 220 —

Kêr eger meylî kunî kird serekey bigre le mişt
Hemeca xaneyî eşq est çi mescîd çi kenîşt

## — 221 —

Ey seruy billind û qed û biro taq û memikcût
Ferqî nebû em şî're legell mîz û legell gût

# Pîtî û

**— 222 —**

## Murad Axay Ako

Ruxandî gerdişî gerdûm le her cê astanê bû
Sûtandî çerxî dûn perwer le her kiwê aşyanê bû

Weku teyyîl sîcîllî lîl kutub pêçayewe gerdûn
Le her mîhman sera asarî sifre û nan û xwanê bû

Be Hatem ger bikey teşbîhî em Axa ye bê eqll î
Ke ferqî em legell ew asman û rêsmanê bû

Dirêx bo xanedanîy Haris Axay serwerî Ako
Ke cêgey ‘eyş û ‘eşret û menbe‘î emn û emanê bû

Le cûd û bexşiş û en‘amî xoy û qewm û etba‘îy
Weku Şaname û Rostem le her cê dastanê bû

Keyumersî duwem Cemşîdî sanî Xusrewî salîs
Sileymanî zeman Eskenderî sahêbqirranê bû

Şewî wek zulfî yar e wirûdî hesûd û bextî min tarîk
Legell dîcûr û yell da wa hîsab ke tew‘emanê bû

Be namerdî şehîdyan kird weku Hemze û ‘Umer, dujmin
Murad Axa ke rojî ceng û de‘wa qehremanê bû

Kesê em seruy re‘nayey le pê xist gerdinî bişkê
Çi zêba sûretê, ya reb, çi şîrîn newcewanê bû

Muradyan bo ye naw nabû le wextî bexşişî û en‘am
Le bo babî Murad destî Kerîmî nerdebanê bû

Le heq şêx û mela û derwêş û sofî sa‘îl û seyyah
Weku Hatem şefîq û dillnewaz û mîhrebanê bû

Îtir netbê le mullkî Rom Reza umêdî asayiş
Le pêş em kare da umêdî to bew parçe nanê bû


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## — 223 —
## Suleymanî ke darulmilkî Baban bû

Le bîrim dê Suleymanî ke darulmlikî Baban bû
Ne mehkûmî ‘ecem ne suxrekêşî alî ‘Usman bû

Le ber Qapî Sera sefyan debest şêx û mela û zahîd
Metafî ke‘be bo erbabî hacet Girdî Seywan bû

Le ber tabûrî ‘esker rê nebû bo meclîsî paşa
Seday mozîqe û neqqare ta eywanî keywan bû

Dirêx bo ew zemane ew deme ew ‘esre ew roje
Ke meydanî cirîdbazî le dewrî Kanî Askan bû

Be zerbî hemleye Bexday tesxîr kird û têy hellda
Suleymanî zeman, rastit dewê, bawkî Suleyman bû

‘Ereb înkarî fezlî êwe nakem efzel in emma
Selahedîn ke dinyay girt le zumrey kurdî Baban bû

‘Umumî şehir baran û selatînî Ferengistan
Le ru‘bî setwetî ew şêre da giştî herasan bû

Quburî pirr le nûrî alî Baban pirr le rehmet bê
Ke baranî kefî îhsanyan wek hewrî nîsan bû

Ke Ebdulla Paşa leşkirî walîy Siney şirr kird
Reza ew wexte ‘umrî pênc û şeş giflî debistan bû

## — 224 —
## Le wextî zerfên da

Ey mela qet to le zerfên da weha xêra nebûy
Ya le hîzî bextî min ya moreket mûy pêwe bû

Hall le sê xallî nîye tu Xuda be rastî pêm billê
Mûy simêllit ya berit ya kilkî yabûy pêwe bû

Wa dezanim mûy rizîwî pîstî debaxxane bû
Çunke asarî ketîre û cewt û mazûy pêwe bû

Peşmî paşit bû mezinde çunke wextî rojhellat
Dîqqetim kird dewûpiştî zerfekan gûy pêwe bû

Mûy segî girrwêş weha nabê be texmîn sedhezar
Rişk û espê û kêç û kehlekirm û kernûy pêwe bû

Elxerez dû pişkî rohim çû le tirsan ew şewe
Hênde dûpşik û hezarpê û mar û mêrûy pêwe bû

Qaweçî rûy sînîyekey herçend be nînok hellkirrand
Qel'î asarî nekird hêşta beşî toy pêwe bû

Zor nemabû bonî sergên bimkujê way tê degem
Tûkî bin kilkî ker û bargîrî mirdûy pêwe bû

Dawekey mûyîn û girrûynit bekarî hîç nehat
Gerçî her layê dûsed efsûn û cadûy pêwe bû

Damenê bo baz û şahên dawî peşmîn ey kere
Ker ke dayna dawî peşmîn her be paşûy pêwe bû

**— 225 —**

## Nînokî Şêx Reza û kilkî Hesen Hemze

Hesenî Hemze le ser şem ke çî ye tefsîrî
Dest be şimşêr legellim sahêbî de‘wa derçû

Min witim naxwênî şêr e, witî kilkî şêr e
Le ser em lefze be sê şorriş û xewxa derçû

Girewim kird legellî çûm û kitêbim hêna
Naxwênî min nebû, kilkî Hesen Axa derçû

**— 226 —**

Ceng gahî cûkil û Mehmûd Beg şêrwane bû
Aferîn Mehmûd Beg lem cenge da şêr, wa nebû

Weqtê qasîd hat û lêm pirsî çilon bû em şerr e
Wirde wirde boy beyan kirdim ke çî şîrrrr wa nebû

**— 227 —**

Selahedîn ke îslamî geyande payey eflak
Eme wa bû ewend bû ew le zumrey kurdî xoman bû

**— 228 —**

Şud ‘edidî bazî masî û dû
Qadrî Westa Xile rîşit be gû

**— 229 —**

Silêmanî hetane nawî nabem wek kunî bêçû
Weku daynêy le ser bergî şeqayiq cê simî ahû

## — 230 —

Ey melay milze'îfî Xurmatû
Ne're ye, berkeş, ey xerî ma, tû

# Pîtî w

**— 231 —**

Lazim e bo şêx sibeynan gurgexew
Ta billên şêx ‘abîd e û naniwê be şew

**— 232 —**

Nan û doşawî eman wa bû be yaprax û pillaw
Bûy be gewrey ehlî Nodê, kake law

# Pîtî x

**— 233 —**

Şêx Mihemed Elî û çend neferê çûyne uçax
Gişt be keyf û be nîşat û be sirûr û be demax

Gerçî çend rojê bû te'lîmî tifengbazîy dekird
Rostem asa çûwe parêz le yekê tîtle bîcax

Her ke engawtî witim: Dek des û bazût nerizê
Her kesê pêt nellê Rostem teres e û qurrimsax

# Pîtî y

234

Petîyey besreyî û mêzerî hîndîy min û to
Weku rext û şeq e bendê ke le gacûtî bidey

# Pîtî z

**— 235 —**

Kuzî Gazê egezê kêr weku gaz
Berî ‘ersey pan e wek deştî Hîcaz

Qîtkeyekî heye wek kêwî Demawend ‘Ela
Pirr le hêlane kew û qişqirre û kotir û baz

**236**

Bom denêrê nîsk û nok û sûtenî û xake û xellûz
Lazim e bo gorrî Hacî her bixwênim qul ‘eûz

Hatemîş, rastit dewê, nagate Hacî bo sefa
Mahî Enwer key debête neyîrî ‘alem firûz

237

Herweku eşkim be rengî sûrî xoy xwênîn e kuz
Dastanî Şahnamey Xesrew û Şîrîn e kuz

Înşiqaqî herweku kallek le ber şîrînî ye
Her kesê neyçeştibê nazanê çend şîrîn e kuz

# Nêwan Şêx Reza û kesanî tir

## Şêx Reza û Mela Marifî Mestî

**— 238 —**
### Şêx Reza hecûy Mela Marifî Mestî dekat

Witim ey şoxî perî çîhre emet pêwe deçê
Witî yarayî ciwabim nîye xot eyzanî

Witim her lêy exem û têy ebirrim mestî jin
Witî her ezyetî giyanim mede xot eyzanî

**— 239 —**
### Wellamî Mela Marif

Witim ey şêxî dirozin desî gandanit heye
Witî em pirsete hî xeyre ye bo xot eyzanî

Witim ey destî gewadît heye bo gullçe? Bellê
Witî manî‘ çî ye bo dost? Û eto xot eyzanî

## Şêx Reza û Şukrî Fazillî

### — 240 —
### Le nêwan Şêx Rezay Tallebanî û Şukrî Fezillî da: Hecûy Şêx Reza bo Şukrî Fezillî

Pûre Şukrî besî ye ba netgêm û simtit leq nekem
Dayke kêrxorit hewalley sûrî sereblleq nekem

Niyetim bû def'eye xomit piya dem baz witim
Neqs e bo emsalî min ba giwê le her ehmeq nekem

Min ke şahbazî şkarendazî şahîm pê dellên
Heyf e ba ahengî cengî serger û leqleq nekem

To be carê wek jinî fahîşe pêt lê hellbirrî
Ne', witim, xeyrî nîye, çawêkî ger lê zeq nekem

Hîze sa xot bigre ta bot bême meydanî mesaf
Şert bê hîçit pê nellêm ta bin gunit nesteq nekem

Konehîzî şarî Bexda, lêm heram bê şa'îrî
Ger kuzî xuşkit weku eywanî Kîsra şeq nekem

Herweku mestîm be ferdê ga,Xua rohim neba
Mulhîdî kafirmezeb ger toş be ew mulheq nekem

Min dezanim kê le xiştey birdûy emma çi sûd
Seyîd e, Seyîd qisey sûkî debê derheq nekem

Pêy billê ba muntebîh bê toyş genû gû bes bixo
Ba Silêmanî be carê kafirî mutlleq nekem

‘Ehde kirdûme le xizmet Şêx Reza da wirçe kiwêr
Neyxeme naw lingî daykit ta le toy îreq nekem

## — 241 —
## Wellamî Şukrî Fezillî bo Şêx Reza

Gû mexo ya Şêx îtir ba şorrişê berpa nekem
Xot û Kerkûkit be carê serbeser îfna nekem

Hênd heremtim gawe bêziraw e le çawim besyetî
Ba le naw lingî jinit pêçallî sed cola nekem

Muddetêk e namewê bîgêm û to lêm nagerrêy
Ba kuzî wek qel'eyî Xeyber be metreq wa nekem

Destî çewrî xot be ser xellqa mesû bêabrrû
Mestî elheq gatî em sîrre ellêm îfşa nekem

Şukrî hênde qudretî zor e legellta bête ceng
Ew eka teqye û ellê toş Şêx î hecut ba nekem

## — 242 —
## Şukrî Fezillî le hecûy Şêx Reza da

Şêx Reza ‘erzit bigêm xot bo çî ehmeq kirduwe
Qewçe wek maker ekeyt û herdû giwêt leq kirduwe

Panîy simtit karî xopiyadanî zor e konehîz
Diyar e êşî nêşî sabîq çawtî zeq kirduwe

Dûdekî bûy ta jinit hêna û gewadî hate ser
Qehbegullçînîş etoy gewwadî mutlleq kirduwe

Kes nema neygê le derwêş û murîd û dostan
Min be metireq bareha kuzîm şeq û peq kirduwe

Çend kerret parey gewadît lê standûm hey teres
El‘eceb wa xot be şêxî tekye mulheq kirduwe

Şahêdî pê nawê çend car caşkî têm birdûyî
Tom newek her carê hetk û petk û nesteq kirduwe

Şêx Reza me‘lûm e, ey Şukrî, bed û bedxulqete
Çend kerret kêrmî be destî xoy le xoy req kirduwe

## — 243 —
# Wellamî Şêx Reza bo Şukrî Fezillî

Şukrî le daxî to eme sallêke ya duwe
Kêrim nexoş e hallî perêşan e kewtuwe

Carê bipirse muxlîseket çon e çon nîye
Mehsûbe koneket ‘eceba mawe mirduwe

Kuştey fîraqî to ye ‘îlacî eger nekey
Oballî bew milet ke dellêy nêrke karduwe

‘Emden dellêm nexoş e mura‘atî to dekem
Werne demêk e ruhî be cennet sparduwe

Ger min diro dekem ewe daykit bipirse lêy
Yaye be destî xoy kifn û difnî kirduwe

Şane û xene û hemamî heram kirduwe le xoy
Paş rehmetî heram e le min siwêndî xwarduwe

Êsteş kirasî çillkin e nawlingî kullkin e
Wek dêwellûke tûkî berî bistê hatuwe

Yaye eger segirme be jêr kurkeya biçê
Her wa dezanê laqe melêkî piya çûwe

Yaye ke me‘berî dubrî û dehlîzî kuzî
Yataxî eşqiya ye guzergahî ordu we

Şî‘rê ke to be çakî dezanî şiyake ye
Nezmê ke to beyanî defermûy gen û gû we

Herwek tisê ke cewherî xoy derbixa be ba
Namûsî xot be şî‘rî sefîhane birduwe

Bem şî‘re bêferranewe nabî be Şêx Reza
Zehmet mekêşe ayîne karî Eresto we

— 244 —
## Wellamî Şukrî Fezillî bo Şêx Reza

Rêşanî kêrî xom ke le jinta retanduwe
Ser simî dawe kewtuwe cergî pisanduwe

Hênd tenke qehbe ye derbendî naw kuzî Gullê
Bêçareyey xişanduwe perasûy şkanduwe

Ya Şêx etoş temate siwarî elem bibî
Hallî xirap e sist û seqet mawe mandû we

Kellbet nemawe hîze ke bêsûd e ‘efe‘efit
Pîrî dûtayî kirdûy şanit xefanduwe

Hecût ke beytî kurdî ye bo kêrmî dekey
Em qorreqorre hîçe Reza tom tirranduwe

Lêşawî kêrî metlleb e Gullçîn weger ne boç
Wek taqî pirdî Xase kuzî daçeqanduwe

Damaw e, dêy zebellahî tis‘înî bête pall
Bêganî tawî dawe kuzî daweşanduwe

Şukrî be ganî kunî kuzî bêre nezmewe
Zorî nedawe, sed mile kêrî teqanduwe

## — 245 —
## Şêx Reza le hecûy Şukrî Fezillî da

Hîzê ke eger qise bibestê be rezawe
Bêşik be helallî le kuzî daykî nezawe

Bê hîkmet û bê qîmet û bê cê nîye şî‘rî
‘Umrî le hewell taku exîr tîya ke, rizawe

Şukrî gen û gûxorî Silêmanî ye êste
Herçende ke emdî weku lotî degerrawe

## — 246 —
## Wellamî Şukrî Fezillî

Nabestê be naheq kesê herfê be Rezawe
Îlla ke le ber teb‘î reza ye le Xuawe

Şî‘rit ke be xot medhî bikey elheq mî‘r e
Pêy nageye naw komell û rîzî şu‘erawe

Xozget be zirre şayerê ey lotîy-lûgî -
‘Umrit le bedî da ke rizawîş û zirrawe

## — 247 —
## Şêx Reza le hecûy Şukrî Fezillî da

Çûme xizmet yaye mumtazim witî laço dizî
Pêm nîşan da esllî meqsed naye ber destim kuzî

Çende hawarim le kêrim kird nekey fîle nekey
Giwêy nedamê xoy hewa daye naw qe‘rî kuzî

Herweku maker fişî kird û le jêrma qewçeqewç
Aferîn bo dakî Şukrî û çawî wek karmamzî

**— 248 —**
## Wellamî Şukrî Fezillî

Xot le gullçîn gêl ekeyt û katî aşkarî û dizî
Herweku dolkey tekêy lê hatuwe dollçey quzî

Mêrminallî Berteke ew balliqî kirdûn hemû
Bareha kêrim le quzya bo qingîşî hellxizî

Ehlî Kerkûk kes nema lêy têr nebê ey konehîz
‘Eyb û ‘arit zor e daynapoşê eş‘arî gizî

**— 249 —**
## Şêx Reza le hecûy Şukrî Fezillî da

Min ke be Şukrî fêr im, hêndem gawe lêy têr im
Katê ke lewim lada ‘Ayişem xiste ber kêrim

Ewîş ewende fillq e, xomî lê helldebiwêrim
Yaye neywîst le dest çim zû rabey naye jêrim

**— 250 —**
## Şêx Reza be yayey dayikî Şukrî Fezillî d\ellêt:

Be quzêkî reş û qingêkî gûyîn
Yaye xoy kirde henarî şîrîn

**— 251 —**
## Wellamî Şukrî Fezillî bo Şêx Rreza

Basî quz û qing wîrdî malltan e
Boye babetî şî‘rit gandan e

## — 252 —
## Şêx Reza le hecûy Şukrî Fezillî da

Nabekarî weku em cûte le'îne lêre
Nebû qet eme muddeyekî medîd û dêr e

Ew be tirr giwêz eşkênêt û emîş qing edirrê
Herdû 'asîn le Xuda kêrî min û em kiwêre

## — 253 —
## Wellamî Şukrî Fezillî

Nabekare, eme çend wexte be smtit fêr e
Hênde bêşerm î û siplleyît û dellêy bêxêr e

Gileyîm lê meke wek xot ke kurrîştim gawe
Zîz mebe hey quzî Gullçînî jinit bem kêre

## — 254 —
## Hecûy Şêx Reza bo Şukrî Fezillî

'Alem û dinya ezanê Şukrî ye kiwêr xercî min e
Şox û şeng e herweku reqqas ellêy mutlleq jin e

Daykî hîzî xellkî Bexda û bawkî gewwadî Sine
Wek Bedî'ey bintî Bekirawa bêçiwaw bêbin e

## — 255 —
## Wellamî Şukrî Fezillî

Lotî reqas min nîm nêregay pîrebin e
Ey le Gullçînî jinit bem unwer dîden bine

Bo çî nazanî le kiwê ye lotîyatî qorîye
Hemûyan şêxjin egên ewîş ellê tînim nene

## — 256 —
## Hecûy Şêx Reza bo Şukrî Fezillî û Cemîl Sidqî Zehawî

Pêm mellên em dû jinet to bo çî ye ey Şêx Reza
Şukrî bo tesk û tiruskî û Cemîle bo sik û za

## — 257 —
## Wellamî Şukrî Fezillî

Ew Cemîley têy ebirdî û lat cemîl û lêy reza
Şukrî şukrit bo ekird Gullçîn le baxellîya xiza

Eyb e hênde siplle bî to zahîren şêx û mela yî
Şapllîtey kêrî min çend car be derqûnta xira?

## — 258 —
## Şêx Reza le hecûy Şukrî Fezillî û Cemîl Sidqî Zehawî da

Jin yekê bû min her emgut ax le des em caduwe
Boç qurrî ‘alem be ser xom da nekem emca du we

## — 259 —
## Wellamî Şukrî Fezillî

Şêx Reza wa diyar e emrro meylî gandanit heye
Hazir im toş rê û şiwênî xasî mîwanit heye

Şî‘reket mezmûnî ‘îczî tîya ye diyar e çawekem
Şert e neyhêllim herçî xarşitî bin ranit heye

## — 260 —
## Şukirî Fezillî bem tercî‘ bende ke şeş beş e hecûy Şêx Reza dekat:

Şêx Reza ‘erzit degêm xot bo çî ehmeq kirduwe
Qewçe wek maker ekeyt û giwêt weha leq kirduwe

Hîze, êşî mêxî sabiq çawtî zeq kirduwe
Qehbe Gullçîn toy kewa gewwadî mutlleq kirduwe

Min be metreq bareha kuzîm şeq û peq kirduwe
Tom wek em care hetk û petk û nesteq kirduwe

Bawkî me'lûmit nîye le'net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

## — 261 —

Îşî zor zor çak e derwêş û feqîrî bênewa
Lingî şêxjin tewq e bo dirzî kuzî keşkollî wa

Her kesê hellsê be xêrî xoy şitêkî tê exa
Peste bazarrî hedîdî baz heta xaney Reza

Tallebanî çîn hemû gewwad û bê şerm û heya
Ger mekanyan bo nebê jinyan le tekyeş her eda

Bawkî me'lûmit nîye le'net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

## — 262 —

Wa le ser Şêxî birat îspatî gewwadî kira
Weqtê lêxen ta billên xellkî le bo babî tira

Boç le meşakî qelender komî jintan dadirra
Komellî kurr qîmetî e'lay be pûlê danira

Xanedanî Şêxî axir xanî dantan wergerra
Kes nema bê to neka heta be hîndîş dira

Bawkî me'lûmit nîye le'net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

**— 263 —**

Gû mexo ya Şêx îtir ba şorrişê berpa nekem
Xot û Kerkûkit be carê serbeser efna nekem

Ba le naw lingî jinit pêçallî sed cola nekem
Ba kuzî wek qel'eyî Xeyber be metreq wa nekem

Mestî fi'len daykî gay em raze ba efşa nekem
Min ellêm to şêxî hecûm meke ba hecût nekem

Bawkî me'lûmit nîye le'net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

**— 264 —**

Nawî Seyid bo çi ebey deyûsî bê nam û nîşan
Gurge bu dumbesurînî konehîzî Talleban

Waqî'a ew pêy witim yek yek bigê daykî ewan
Her le ser qîtkey jinit sed mêxî Cafim daçeqan

Çî bû teqsîrim le xizmetta hezarim lê negan?
Lêre detwit Şêx Elî gewwd e çî bû feriqtan

Bawkî me'lûmit nîye le'net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

**— 265 —**

Min be aşûbim be carê xan û banûtan egêm
Îbnî meşhûrtan deyûs û bedxûtan egêm

Her le kurr ta kiç le sallê sed heta dûtan egêm
Hewş û kolan û bîr û dar û perdûtan egêm
Şert e hîçî dernekem ta kûpe û kendûtan egêm

Bawkî me‘lûmit nîye le‘net le zatit hey teres
Gû be kiwêy daykit çuzanim daye ber kê pêş û pes

**Şêx Reza û Pîroze**

**—266—**

## Le nêwan Pîrozey kiçî Hesen Kenoş û Şêx Reza da
## 1. Hecûy Şêx Reza bo Pîroze

Hesen Kenoşen, He\sen kenoşen
Îne kinaçey Hesen Kenoşen

Keleş, şilleqyaw, nawgelleş boşen
Kunay qîrrîneş dayim wecoşen

Kurkeş dêwaney kellpus nedoşen
Belokeş, lolon, çon gedey mêşen

Her loyê cewêş çil kêr netoşen
Wêney her wefall her wexroşen

Pey kêr qewî xeylê peroşen
Bos û kenar û xellweteş xoşen

**— 267 —**

## 2. Wellamî Pîrozey kiçî Hesen Kenoş

Reza wezeftim rezawe zeftim
Hîç kes nekerden te'eda zeftim

Demit we mabeyn çallî eşkeftim
Biçê we çawta tabkukî çeftim

Tirrim temîret, tisim sazit bo
Kusim befnaway destnimazit bo

Ane çend weqten ehwallit pirsim
Lûtit weku nim demit wekusim

Wey ‘abî dirryarî laşantewe
Wey mayineşê yall pantewe

Wêney çaweşî deholl we doşî
‘Eyanen luskey Hesen Kenoşî

Bê teqye û heya bê şerim huzûr
Ganker jinit mekêşî wejûr

Xizmetkaranit han le kintewe
Mewînî ke ron we kus jintewe

Her le mindallî ta êste bûyte
Keleş xot weban çen kêrê dîte

Îslaman bo Xuda, bi wine şayet
Şeri‘man biken we resim û ’ayet

Bizanin ême duşmin sabîq nîn
Sebeb ey eş‘ar bedferreş pey çîn

Yeqîn ce şube derd harîyen
Rewişt zuşt û merd azarîyen

Buynon we heq xeta ce kamen
Me‘lûm rûsyay xewas û ‘amen

Ewman pesaûpes siwarî her kerken
Xoll û dorrêz û le şar werken

Ey Şêx dîn xas ey Şêx dîn xas
Hekak dana pisporrî ecnas

Segî dindan gêrr aşna nenas
Pey çîyen dûrî ce ra û resmî ras

Tayfey şimrî şumî elxenas
Gemallî gewr, ce kê dekey pas

Yazuxen to kurr şê Ewrrehmanî
Rîş çun gendemûy berî sozanî

Heyat nehêla pey Tallebanî
We her çiwar mezeb layiq nemanî

Ay bo delakê serit bitaşê
Rîşit qut bika çun kilkî caşê

Reza ley kare peşîman bêwe
Bizanî rezay Xua ha we kiwê we

Bexişmet we Xua werne detwanim
Kellet binême nêw ciftey ranim

Wêney seg har ta netxinkênim
‘Ehden kelletî lêş dernehênim

Emin teqyey Şêx Elî emgirê
Erna ‘îlacî Rezam pê dekirê

Me‘lûmen Reza kunay dexurê
Her bem rewşe le xişte debirê

Deste lawêkî denêrme tek
Kuna û kîs guneş bikeron weyek

Biwête pend û ley kare laçê
Pey Şêx Elîyem desim têş naçê

Şêx Elî to Şêx ey şarey çî ye
Reza namûs û heyay la nîye

‘Alem ce Reza derûn pirr êşen
Tehqîq toş ce ew dillit werrêşen

Sereş pankero çun mar jardar
Pend pêşînen şeri‘ mar wedar

**— 268 —**
## Hecûy Şêx Reza bo kinaçey Hesen Kenoş

Herkê le berey Hesen Kenoş e
Kunay qîrînî bo kêr becoş e

Bête hucrekem le tekyey xoman
Emey tê birrim heta pêy xoş e

**— 269 —**
## Wellamî Pîrozey kiçî Hesen Kenoşî

Le dûro hatî wemzanî piyaw î
Nemzanî biniçik seg piyarîyaw î

Kunay qîrînet ger wecoş nîye
Em demdirêjîyey to le pay çî ye

Me‘lûm ew şî‘rey be to da çirrîm
Têrî nekirdûy hey le demit rîm

## Şêx Reza û Yesû Sawik

**— 270 —**

### Şêx Reza hecûy şa'irî kakeyî Yesû Sawik dekat

Yesûgaweke yesûgaweke
Çîştan kerd çenî sîyah gaweke

Wextê bir ama çe zwîlaweke
Şeq û peqyan kerd ce kelaweke

**— 271 —**

### Welamî Yesû Sawik bo Şêx Reza

Kak Şêx her ke kak Şêx hereke
Demkoll û simxirr çem sîyaweke

**— 272 —**

Kuca şud an înayethayê dîrîn
Kuca şud an keramethayê pîşîn
Ne gahî pursîdem xanim ne paŞa
Ne yarim mîkuned xesrew ne şîrîn
Ez în canib nemîdanem sebeb çîst
Ez în canib meger kelayê bîd bîn
Netersd ez zibanê ateşînim
Ce'elnaha ricûmen lîş şeyatîn

**—273—**

Zi çayê telx kamet xand şîrîn
Deha neş rîşbadan merdê kec bîn
Kê keyxisrew be keyxisrew şebîh est
Kuca şîrîn buwed çûn hurîyî în
Tu an hurî kê ez padaş xeyra
Tu ez cennet amedî ba "ez û temkîn
Mela mehmel kuş û nadir nedîm est
Rica nebud kê xanindeş şeyatîn

**— 274 —**

## Şî‘rî Şêx Reza bo Şêx Se‘îdî Hefîd û birakanî katê çûn bo Kerkûk. Em şî‘re Pîremêrd le farisîyewe kirdûye be kurdî:

Mangî remezan têperrî ewsa demî ‘îd e
Hêşta remezan e keçî ‘îdêkî se‘îd e

Meqsed leme min wa ke dellêm cejn e le laman
Teşrîfî hefîdêkî Seyd Şêx Se‘îd e

Kerkûk be me nazî heye emrro le cîhana
Aramgehî pirrşerefî çiwar Hefîd e[1]

Sed şukir le rojî dewlletî dîdarî ‘ezîzan
Sallan dû cejinman debû emsall sê ‘îd e

Cebhe û cibeyan nûr û se‘adet enwênê
Nûrêkî se‘adet le siyadet da bedîd e

Ême hemûman xadimî ewladî nebî bûyn
Çî bikeyn eme teqdîrî Xudawendî mecîd e

Nîsbetî derdî alûdeyî Reza êsta nîye[2]
Her le rojî ezelewe ‘aşiq û derwêş û murîd e

**— 275 —**

## Pênc xiştekîy Pîremêrd le ser beyte şî‘rêkî Şêx Reza

Şêxê bû Reza tîrî qeza bû keçî zû mird
‘Umrêkî legell hecûy kesûkarî be ser bird
Şi‘rêkî cinasî heye zor layiq û zor wird
Qurbanî pelêkim ke pelî Hempelî pel kird
Xoy û segekey herdû be carê şeq û şel kird

**Şêx Reza û Emîn Feyzî Beg**

## — 276 —
## Le nêwan Şêx Rezay Tallebanî û Emîn Feyzî Beg da
## Şî'rekanî Şêx Reza bo Emîn Feyzî Beg

Ke teşrîfî şerîfî hat Emîn Feyzî be mêwanî
Le 'uhdey şukrî dernaçim meger xom kem be qurbanî

Be xatem ger Suleymanî dekird wek min emîn key bû
Nigînî min emînîş e le say Feyzî Silêmanî

## — 277 —
## Em şî'raney xwarewe le layen Mamosta Mihemed Mistefa Heme Borewe kirawin be kurdî

Çi keramet, çi xarîqul 'ade
Ciqle çatir le kewll û succade

Witeyî min kelik û hem kurt e
Bo bitî sade babetî sad e

Gerçî natwanim le zewî rabim
Hînd le cerm û zebûn û uftade

Ger billên pêm heye le Bexdada
Saderûyî letîf û begzade

Weku gerdî evînî dîdarî
Min be serser ke rûm le Bexdad e

Rû be mizgewt neşîm be dû hengaw
Biçime meyxane tund im û amade

Meşirebim meşirebî Emîn Feyzî
Le dû gêtî ke herdû azad e

Ey Reza ta be merg bike rendî
Eme ye dewlletî Xuda dade

**— 278 —**

Lay dana le nawî Emîn Feyzî da
Aşkira ye le hunerî hîca da
Nîşane ye bo yekêtîy min û to
Le nawî namîta zîyad û kemî kiwa?
Be ebced bîjmêrî legell Reza da

**— 279 —**

Çi ‘ecayib ke be bûnî to binazê Bexdad
Her be bûnî to ye asoy dû cihan îsti‘dad

Zerre bew naçîziye tacî evîn defirrênê
Ger le ray roşinî to bê tu bika îstimdad

**— 280 —**

Yarî min wa bo sefer pêy naye naw mallî rîkab
Xaneyî zînî muzeyyen kird û xaney min xerab

Xellkî xoryan katî êware ke lê awa ebê
Min beyanî zû le çawanim ke win bû afitab

**— 281 —**

Wam lê hatuwe le dûrîy kake Emîn
Çep û rastim nezanim kamen û çi în

Wa deka bext ke her nebînmewe yar
Ta bixendim be zeman û be zemîn

Çend errêjim be yadî dûrîy to eşik
Çend ebim min le dewrî towe xemgîn

Ta xemêkim be fêll ke çare dekem
Hî tirim ser deden ke çûn e kemîn

Mestî badem be camî feyzî towe
Weku ‘Îsa le feyz ruhîl emîn

Sallehay dirêj her baqî bê
Be selamet Emînî ême, amîn

**— 282 —**

Nîştecê mumtaz û bo geşitîş to mumtaz hatîyewe
Ewell û axir Emîn Feyzî to mumtaz hatîyewe

**—283—**

Ustadî qise, pîrî wite, mîrî suxen toy
Watagerî û rahnumay toy û pesen toy

Toy kanî kemalatî Emîn Feyzî Efendî
Kogay rûş û ciwanî Huseynîş û Hesen toy

## — 284 —

Meşrebit xoş û lehcet şîrîn e
Gewherîn demte, kan û gencîn e

Fîkrî bîkrit ke beynî beynella
Totya û şîleyî nîgarîn e

Textî Belqîs û rayexî ciwanî
Herdû boy mareyî nîhanî ne

Eme şî‘ir nîye bo nawbang bê
Eme şî‘ir nîye, ‘uqdey perwîn e

Nîweballêkî bîrî ‘tar e
Ke ‘eceb awdar û rengîn e

Çi ‘eceb ger billêm le tezmînî
Hunerêkî şî‘ir ke tezmîn e

Çi be wate giran û sûk hellbest
Eme ye sehlî mumtenî‘ bîne

Ta be zerbul mîslî kewa deyllên
Ke serencam du‘a her amîn e

Xatirit şad bê Emîn Feyzî
Çunke deryayî daniş û dîn e

Duşminit xaksar û tûna bê
Ewe jêrkewtî le‘n û nefrîn e

Fezill zatî Reza le Yezdan e
Ne lewan şa‘îranî xudbîn e

## —285—

Erê ey hunermend to yarî qedîm î
Toy le bo xusrewan şayanî nedîm î

Be hîkmet nameket razandotewe
Le wê da ke to wa dadwerî hekîm î

Lewewe nawî bote Heway Nesîmî
Ke geşey giyan eda heway nesîmî

Be daniş çi hawtay etom her nedîwe
Meger cewrî ferd û durrî yetîm î

Detewê seferê le Yemen dûritir ke
Ey Emîn Feyzî to le dillma muqîm î

## — 286 —

Le towî xamet û le naw henawî qîrtas
Akamî hênd benirx e girantir in le ellmas

Le rûperrey mu'cîze da zorî wek Meryem
Le baweşyan nawe mindallî 'îsewî enfas

Kar geyîye cêye kewa min to ey Emîn Feyzî
Bikem be Cibra'îlî Emîn le rûyî qîyas

Hezar sall ger bimênî, ewe key 'acibatî ye
Bo şer nîn ke aya Xidrî zînde û Îlyas

Raburd lem willate 'umrî Reza be herzeyî
Derya xo gunahî û begerdî pûçe îflas

## — 287 —

## Emîn Feyzî le yad û bîrkirdinî Şêx Reza da em şî'rey wek name bo narduwe. Şî'reke kurdî ye:

Dill le 'eşq û derdî dûrîy to xerîkî biyanû we
Mewsîmî bos û kenarî nêwçewan û zanû we

'Eynî darî gendell e cestem le ber narî fîraq
Bo se'atî dîdenît pirr siklle herwek kiwanû we

Ba le ke'beş bim dillim her ma'îlî bitxane ye
Bo bonî rût murix asa çaweçawî danû we

Te'nî naheq narrewa ye wam le ser 'ehdî qedîm
Wa le kin to û toy tîya, dill îke nem dorranduwe

Min le feyzî towe ye bem mîhneteş hêşta rezam
Bote serbarim gilet cerg û dillmî birijanduwe

## — 288 —
## Çiwarîneyekî kurdîy sêdêrrîy Emîn Feyzî ye û çiwaremî Şêx Reza tewawî kirduwe:

Meger weqtê muradî min be cê bê
Xirîngey pawaney zîwî Xecê bê

Ewendem gut Reza derdestke fermûy
Billê Feyzî le cê bêt û le cê bê

## — 289 —
## Şî‘rêkî yekbeytîy turkî. Nîwedêrrî yekemî Şêx Rreza ye û nîwey duwemî Emîn Feyzî:

Dewlletin sadiqesî çoq yaşe paşa
Kîmse olmaz sene manend muadil haşa

## — 290 —
## Em beyte farisîyeş be heman şêwey şî‘rî pêşû

Întizamê hemê ‘alem be întizamêl ‘ulam est
În suxen mezher tesdîqê cemî‘ê hukema est

## 291
## Çiwarîneyekî Emîn Feyzî Beg be turkî ke bo Şêx Rezay narduwe supasî ekat bo ew şî‘raney boy nardibû:

Wasil oldî destime aşar kiz
Pek guzeldir guxrîsî afkar kiz
Xirq nur mefxeret oldiq o gun
Çoq şikir bu ebd bî miqdar kiz

## Şêx Reza û Muftî Derwêş Efendî

**— 292 —**

# Şî‘rekanî Şêx Reza le hecûy Muftî Derwêş Efendîy Kerkûk

Yektirî de‘wet eken ehlî diyanet be quzî
Kurrî Muftî be qingî, xanimî daykî be quzî

**— 293 —**

Mallî Muftî lem bere, me‘lûm e Qazîş lew ber e
Min feqîr im kê dezanê lem ber im ya lew ber im

**— 294 —**

Tehtî tuqîfe alindî qewî alinsun kêrete
Xelqî eyçun çahî qizan çahe duşer elbete

Hebse îqafe dîmek Besre`den surmek
Besireden bumbeye mîn bumbe îla kelikete

Nase îbret olîr îtmelîdir wuq`enwîs
Teres tercemeyî halinî pebtî xezete

Ah çi xoş e be çeqo giwêy le bina xişt bibrrin
Rîşî qut ken be meqes bîkene meymûne qute

Be def û da‘îre û zemzemewe dûy bikewin
Lê biden çeplle billên bênewe kurrgel emete

**— 295 —**

## Şî'rî Şêx Reza le stayişî Muftî Zehawî da

Ey maderî gêtî to heta êsta nezawî
Zatêkî weku Feyzî Efendî Zehawî

**— 296 —**

Mumkîn nîye îdrakî heqayiq be tewawî
Mumkîn nîye îdrakî neka zîhnî Zehawî

**— 297 —**

## Şî'rî Şêx Reza le hecûy Cemîl Sidqî Zehawî kurrî Muftî Zehawî

Heyzî kuzî hîz û dirzî feyruz e giwawî
Me'cûnî xene û wisme ye bo rîşî Zehawî

**— 298 —**

Pêm mellên em dû jinet bo çî ye ey Şêx Reza
Şukrî bo tesk û tiruskî û Cemîl bo sik û za

**— 299 —**

## Hecûy Şêx Reza be 'erebî bo Cemîl Sidqî Zehawî

Equlu qewlen leyse fîhî îftira
Ummu Cemîlîn ewledethu mîn wera

În lem tuseddiq qewlî ema tera
Fî wechihîl musxerrî asarul xera

## — 300 —
## Şî'rî Şêx Reza bo Ebu Cemîl (bawkî Cemîl Sidqî Zehawî wate Muftî Feyzî Zehawî)

Qeblel mewtî qale Ebu Cemîl
Lî zewcetihî îsbirî sebren cemîla

Felem tesbir ‘elal fehşa‘î yewmen
Weqed ce‘elet sebîleha sebîla

## — 301 —
## Wellamî Cemîl Sidqî Zehawî bo Şêx Reza

Hecana Reza mîn xeyrî da‘in lî hecwina
Kezake kîlabul heyyî bîtteb‘î tenbehu

## — 302 —
## Hecûy Muftî Zehawî be kurdî bo Şêx Reza

Bo xoy muqedîm, Talleban tallî
Ref‘ û wez‘iyan le întac xallî

Ger ellêy çî ye ew kêre sîse
Pêy bawerr meke elfî te‘nîs e